

Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî 7


Kurd

Rûnkirin û Dîtin
Kurd Nevîyên Mîdîyan

V.F. Mînoriskî

Werger Dr. M.S. Cuma

L.
S



Institut kurde de Paris

4505

De:



Institut kurde de Paris

The following are the types of descriptive writing that you may encounter:

- **Expository** – explains something or someone.
- **Narrative** – tells a story.
- **Process** – describes how to do something.

1973-1974: 100% improvement of

1990-1991, 1991-1992, 1992-1993, 1993-1994, 1994-1995, 1995-1996, 1996-1997, 1997-1998, 1998-1999, 1999-2000, 2000-2001, 2001-2002, 2002-2003, 2003-2004, 2004-2005, 2005-2006, 2006-2007, 2007-2008, 2008-2009, 2009-2010, 2010-2011, 2011-2012, 2012-2013, 2013-2014, 2014-2015, 2015-2016, 2016-2017, 2017-2018, 2018-2019, 2019-2020, 2020-2021, 2021-2022, 2022-2023, 2023-2024, 2024-2025, 2025-2026, 2026-2027, 2027-2028, 2028-2029, 2029-2030, 2030-2031, 2031-2032, 2032-2033, 2033-2034, 2034-2035, 2035-2036, 2036-2037, 2037-2038, 2038-2039, 2039-2040, 2040-2041, 2041-2042, 2042-2043, 2043-2044, 2044-2045, 2045-2046, 2046-2047, 2047-2048, 2048-2049, 2049-2050, 2050-2051, 2051-2052, 2052-2053, 2053-2054, 2054-2055, 2055-2056, 2056-2057, 2057-2058, 2058-2059, 2059-2060, 2060-2061, 2061-2062, 2062-2063, 2063-2064, 2064-2065, 2065-2066, 2066-2067, 2067-2068, 2068-2069, 2069-2070, 2070-2071, 2071-2072, 2072-2073, 2073-2074, 2074-2075, 2075-2076, 2076-2077, 2077-2078, 2078-2079, 2079-2080, 2080-2081, 2081-2082, 2082-2083, 2083-2084, 2084-2085, 2085-2086, 2086-2087, 2087-2088, 2088-2089, 2089-2090, 2090-2091, 2091-2092, 2092-2093, 2093-2094, 2094-2095, 2095-2096, 2096-2097, 2097-2098, 2098-2099, 2099-2100, 2100-2101, 2101-2102, 2102-2103, 2103-2104, 2104-2105, 2105-2106, 2106-2107, 2107-2108, 2108-2109, 2109-2110, 2110-2111, 2111-2112, 2112-2113, 2113-2114, 2114-2115, 2115-2116, 2116-2117, 2117-2118, 2118-2119, 2119-2120, 2120-2121, 2121-2122, 2122-2123, 2123-2124, 2124-2125, 2125-2126, 2126-2127, 2127-2128, 2128-2129, 2129-2130, 2130-2131, 2131-2132, 2132-2133, 2133-2134, 2134-2135, 2135-2136, 2136-2137, 2137-2138, 2138-2139, 2139-2140, 2140-2141, 2141-2142, 2142-2143, 2143-2144, 2144-2145, 2145-2146, 2146-2147, 2147-2148, 2148-2149, 2149-2150, 2150-2151, 2151-2152, 2152-2153, 2153-2154, 2154-2155, 2155-2156, 2156-2157, 2157-2158, 2158-2159, 2159-2160, 2160-2161, 2161-2162, 2162-2163, 2163-2164, 2164-2165, 2165-2166, 2166-2167, 2167-2168, 2168-2169, 2169-2170, 2170-2171, 2171-2172, 2172-2173, 2173-2174, 2174-2175, 2175-2176, 2176-2177, 2177-2178, 2178-2179, 2179-2180, 2180-2181, 2181-2182, 2182-2183, 2183-2184, 2184-2185, 2185-2186, 2186-2187, 2187-2188, 2188-2189, 2189-2190, 2190-2191, 2191-2192, 2192-2193, 2193-2194, 2194-2195, 2195-2196, 2196-2197, 2197-2198, 2198-2199, 2199-2200, 2200-2201, 2201-2202, 2202-2203, 2203-2204, 2204-2205, 2205-2206, 2206-2207, 2207-2208, 2208-2209, 2209-2210, 2210-2211, 2211-2212, 2212-2213, 2213-2214, 2214-2215, 2215-2216, 2216-2217, 2217-2218, 2218-2219, 2219-2220, 2220-2221, 2221-2222, 2222-2223, 2223-2224, 2224-2225, 2225-2226, 2226-2227, 2227-2228, 2228-2229, 2229-2230, 2230-2231, 2231-2232, 2232-2233, 2233-2234, 2234-2235, 2235-2236, 2236-2237, 2237-2238, 2238-2239, 2239-2240, 2240-2241, 2241-2242, 2242-2243, 2243-2244, 2244-2245, 2245-2246, 2246-2247, 2247-2248, 2248-2249, 2249-2250, 2250-2251, 2251-2252, 2252-2253, 2253-2254, 2254-2255, 2255-2256, 2256-2257, 2257-2258, 2258-2259, 2259-2260, 2260-2261, 2261-2262, 2262-2263, 2263-2264, 2264-2265, 2265-2266, 2266-2267, 2267-2268, 2268-2269, 2269-2270, 2270-2271, 2271-2272, 2272-2273, 2273-2274, 2274-2275, 2275-2276, 2276-2277, 2277-2278, 2278-2279, 2279-2280, 2280-2281, 2281-2282, 2282-2283, 2283-2284, 2284-2285, 2285-2286, 2286-2287, 2287-2288, 2288-2289, 2289-2290, 2290-2291, 2291-2292, 2292-2293, 2293-2294, 2294-2295, 2295-2296, 2296-2297, 2297-2298, 2298-2299, 2299-2300, 2300-2301, 2301-2302, 2302-2303, 2303-2304, 2304-2305, 2305-2306, 2306-2307, 2307-2308, 2308-2309, 2309-2310, 2310-2311, 2311-2312, 2312-2313, 2313-2314, 2314-2315, 2315-2316, 2316-2317, 2317-2318, 2318-2319, 2319-2320, 2320-2321, 2321-2322, 2322-2323, 2323-2324, 2324-2325, 2325-2326, 2326-2327, 2327-2328, 2328-2329, 2329-2330, 2330-2331, 2331-2332, 2332-2333, 2333-2334, 2334-2335, 2335-2336, 2336-2337, 2337-2338, 2338-2339, 2339-2340, 2340-2341, 2341-2342, 2342-2343, 2343-2344, 2344-2345, 2345-2346, 2346-2347, 2347-2348, 2348-2349, 2349-2350, 2350-2351, 2351-2352, 2352-2353, 2353-2354, 2354-2355, 2355-2356, 2356-2357, 2357-2358, 2358-2359, 2359-2360, 2360-2361, 2361-2362,

Institut kurde de Paris

inveçîşîq nêşîşîq p. 1999. Berlin, di 17. 6. 1999 de

Kurtîya jîyana min di nava çend rêz û dêran de

Ez di dawîya gulana sala 1937 de li gundê Kêstek de li Herêma Cezîrê de li Kurdistana Surî de ji malbata Başokê Yezîdîyî Musulman de hatime bizayîn; jiber ku fermana Bav û kalên min li ser destên Selteneta Osmanî de der sedsalê nozdehan de li Şingalê de hate birakirin û bi darê zorê ve gumgume bi destên me ve dane bihilgirtin.

Min xwendina xweyî dibustanê li bajarê Qamişlo û Şamê de ji sala 1946 tanî sala 1959 de di nava hin dibustanên Suryanî de date bidawîkirin.

Di pêşî de di payîza sala 1959 de min li bajarê Şamê de di zanistgeha wê de di berê felsefê de date bixwendin.

Di pişt re di buhara sala 1960 de li Elmanya Fêderalî de li bajarê Monîx de di zanistgeha wê de di berê zanistîyên dewletê de tanî sala 1963 de date bixwendin.

Di payîza sala 1963 de bi saya Partîya Demokrati Kurdistan ve xwendin li Elmanya Demokrati de bi destên min û neh Hevalên dinî Partî ve hate bikevtin û min li Berlîna Rojhilat de di Kolêca Aburî de aburîya siyasî date bixwendin.

Di tîrmeha sala 1967 de min têde Diplom di zanistîya mêjûwa aburîya siyasî de date biwergirtin û herwehaji têde di rêşmeha sala 1972 de min Doktora di zanistîya mêjûwa aburîya siyasî de date biwergirtin.

Ji sala 1972 - 1975 de min di warê wergerandinê de didate bikarkirin.

Ji sala 1975 tanî sala 1992 min li zanistgeha Humbold de li bajarê Berlin de di berê mêjûwa aburîya siyasî de bi

giştî ve û di mêjûwa aburîya siyasîya Dewletên paşkevî de bi taybetî ve didate bikarkirin.

Ji sala 1953 de min xwe bi zimanê meyî şêrîn û perest ve didate bimijûlkirin û wî û herwehaji mêjûwa me tevaya bala min bi ser xwe ve didatin birakişandin. Bi xewna zarotîya min ve di hate biderkevtin, ku ez di warê wî û herwehaji mêjûwa me de bidim bikarkirin û wan bidim bipêşvexistin, da ku mîletê Kurd ji sedsalên navî û bendîtîyê de bête birizgarîkirin û bi serxwebûnê ve di nava Kurdistanê de bête bitackirin; jîbervêjî ve ez ji bona xwendekarîyê ji bona Ewropa hatim biçûyîn.

Cîhanbînîya min di têgihiştina diyalêktîka jînê de li ser felsefa Zerdestî, Aristo, Xanî, Hegel û Marx de têtê bibingehkirin û têgihiştina min di çarekirina pîrsa kurd de û pêkanîna Dewleteke Mîliyî ser bi xwe ve di nava Kurdistanê de li ser rêbazê Barzanî û felsefa Xanî de têtê bicî û biwarkirin.

Ji sala 1953 de û hêjî ez bi Endamê Partî ve têtîm biderkevtin û her û her ez bi jêhatî ve di nava rêzên wê de bi mîna Endamêkî ve didim bikarkirin.

Di nava salên 1979 tanî sala 1993 de bi Endamê Komîtîya Nawendî û Endamê Mekteba Siyasî ve dihatim biderkevtin.

Di sala 1996 de ez bi Nîşana Barzanî ve hatim bixelatkirin û herwehaji bi Rawêjkarê Siyasî ve ji bona Mesûd Barzanî hatim bidestnîşankirin.

Ji sala 1964 de min jinek Elmanî dayite bianîn û lawekî me bi navê Ciwan ve têtê bidîtin, yê ku ew bi yekekî ve ji Zanistvanên Gencên Elmanî ve di Zanistîya Elektironik de têtê biderkevtin.

Min di jîna xwe de ji xwe re bi zimanê Erebi, Ingilîzî, Suryanî, Farisî, Elmanî û Rusî ve dayête bixwendin; belam min Suryanî û Rusî dane bijibîrakirin.

Li vêderê de ez hinek ji karên xwe li ber destên
Xwendevanên giramî de didim bidanîn û ew jî evin; tevî
ku armanca min di jînê de tête biderkevtin, ku ez sed
nivîstan bi Kurdî ve bi zaravayê kurmançî ve ji bona
nivîstxana Kurdî bîdin binivîsandin:

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1931-1958
Mesud Barzanî

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1958 - 1961
Mesud Barzanî

Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê
Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê
Mohemed Emîn Zekî Beg

Mêjûwa Dewlet û Mîrneşîniyên Kurd Di Pêla Musulman-
tîyê De
- Bergê Duwem Ji Kurtîya Mêjûwa Kurd û Kurdistan -
Mohemed Emîn Zekî Beg

Pirsiyarîya Kurd
Mêjûwa Kurdan û Neha Wan
(Civata Xweybûnî Kurdîyî Welatperwer)
-Belavoka Pêncem -
Dr. Bilêc Şêrkoh
Kurd
Rûnkirin û Dîtin
Kurd Nevîyên Mîdîyan
V. F. Mînoriskî

Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de
Profisor A. Hesretyan

Der Barê Sitratîciya Siyasî û Sipahî ya
Tevgera Welatîyî Kurd
-Temaşekirinek ji bona Mêj û Neha, herwehaji yekeke din
ji bona Ayinjî de-
Ismet Şerîf Wanlî

Zanistîya Mêjûwê li Ewropa de, Felsefa wê, Şeweyê wê,
Pêşkevtina wêna, Rûnkirinên li ser Mêjûwa Kurdistanê û
Dîroknivîsandina Rojhilatê de
Doktor Ismet Şerîf Wanlî

Tevgera Kurd di serdema nuh û neha de
Akadîmiya Zanistîya Yeketîya Sovyêtê û Akadîmiya Za-
nistîya Ermeniya Sovyêtê; Mosko, di sala 1987 de

Mîr
Nikolo Mikavili

Peymana Civakî
Jean-Jacques Rousseau

Pêşkevtina Sosyalistîyê ji Otopîyê tanî Zanistîyê
Friedrich Engels

Rola Kar di Veguhertina Meymûnan de ji bona Merovan
Friedrich Engels

Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de
Lenin

Sê Kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê
Lenin

Zîneta Zimanî di nava Heremên Kurdî de
R. I. Tissabolov

Li ser rêya azadîya Kurdistanê de
-Çend bîr û bawerî li ser hin rudanên siyasîyî de ji sala
1956 - 1975 de-
Dr. M. S. Cuma

Herrwehaji min di sala 1966 de namilkeyek di bin nav
û nîşana: Li ser tirba Pêro de date bibelavkirin

Herwehaji min Manêsta Partiya komunist ji bal Karl
Marx - friedrich Engels de di sala 1975 de ji bona zimanê
Kurdî zaravayê kurmançî date biwergerandin û ew di
weşanên Ronahî de di sala 1976 de hate biçapkirin.

Herwehaji min di gelaveja sala 1986 de: Sî sal mêjûwa
Komela Xwendevên Kurd li Ewropa date binivîsandin. Ew
ji bal Komela Xwendevanên Kurd li Ewropa de di
gelavêja sala 1986 de li bajarê Berlina Rojava de hate
biçapkirin.

Dr. M.S.Cuma

Naunîşan: Kurd
Nivîskar : V. F. Mînoriskî
Werger : Dr. M.S. Cuma

Çapa yekem : Kurdî - Kurdmancî - 1999
Çapxana : Rewşenbîrî - Hewlêr - Kurdistan
Dane : 1000
Leyawt: Govend M.H. - Berig: Serdem
Mafeyê Çapkirinê parastîye - 1999

Jimara spardîne (106) li sala 1999

Rêza Barzanî ji Nivîstên Kurdî (7)

Kurd

Rûnkirin û Dîtin Kurd Nevîyên Mîdîyan

V. F. Mînoriskî

Diyarîya Daner

Ji bona Pîreka min û Hevrîya Rêya min
vî berê pêşîyî çûna me di sala 1914 de didim
bipêşkeşkirin.

Werger Dr. M. S. Cuma

Mafeyê Çapkirinê parastîye - 1999

Jimara spardinê (106) li sala 1999

Çap: Çapxana Rewşenbîrî - Hewlêr - Kurdistan

NAVROK

Pêşgotina Kurmancî	1
Derîyê Pêşî	9
Li Rusya de	12
Li Faris de	13
Li Turkîyê de	14
Derîyê Duwem	17
Derîyê Siyem	31
Derîyê Çarem	35
Derîyê Pêncem	46
Derîyê Şeşem	58
Derîyê Heftem	73
Derîyê Heştem	83
Pêşgotina Dr. Kemal Mezher ya Erebî	87
Kurd Nevîyên Mîdya	89
Kar û barên Daner di warê Xwendekarîyên Kurdî de	98

Institut kurde de Paris

Pêşgotina Kurmancî

Xwendevanên hêja! Vaye ez ji bona nava destên we vê Nivîsta Minoriskî Beşê yekem: Kurd, Rûnkirin û Dîtin û Beşê duwem: Kurd Nevîyên Mîdîyan¹ bi dilxweşî û bextiyarî ve didim bidanîn.

¹Xwendevanên hêja!

Di 15. 8. sala 1998 de li bajarê Berlin de di cîvina bîranîna zayînî Partiya Demokratî Kurdistan de di 16. 8. 1946 de çavên min bi Dr. Maruf Xeznedar ve di vê cîvinê de Cavên pêhate bikevtin. Em li ser hin nivîstên Minoriskî de hatin biaxivtin û wî ji min re date bigotin, ku nivîsta Kurd Nevîyên Midya ne ji bal Minoriskî de lêbelê ew ji bal Tewfîq Wehbî hatiye binivîsandin. Jibervêjî ve min jê date bixwestin ku ew bîr û bawerîya xwe di vî warê hanê de ji min bide binivîsandin, berî ku ew ji bona Kurdistanê bête bivegerandin. Herwehaji min jê date bixwestin, ku ew wê bîr û bawerîya hanê bi tîpên latînî ji min re bide binivîsandin, da ku ez wan di rûnkirinekê de li ser Nivîsta Kurd Nevîyên Midya de ji bona Xwendevanan bidim binivîsandin. Wî ew name ji min re date binivîsandin û ez jî wê niha li vêderê de ji bona Xwendevanên didim binivîsandin, beyî ku ez hîç bawerîyekî li ser de bidim biderxistin. Ez pir sipasî Dr. Maruf Xezndar li ser vê rûnkirina hanê de didim bipêşkeşkirin. Evaya bi navrona vê nameya hanê ve tete biderkevtin:

„Bo berêz Mamosta Mohamed Salih Cuma:

Em-katetan baş

Ewey min agedarim li babet ew basey li ser Medyekan nûsrawe, goya Menoriskî nûsiwyetî û be nawî wiş bilawkirawtewe ewey layê xwareweye:

Le duwayi mirdini Mînoriskî le Lenden le sali 1966, erşivî taybetiyî xoy le sali 1967 le Lendenewe gostraye bo şari Liningirad (Santpeterburg) we le Institutê Rohilatnasi Ekadimiyetî Zanistî parêzra. Le Erşivekeda basekî mêjuyî li ser Madekan hebûwe be inglîzî nûsrabûwew, le kafî xo de Tewfîq Wehbî em base nûsibûwe û bo Mînoriskî nardibû bîr û rayî xo li ser bida. Wabû Mînoriskî mird, baseke li naw erşivî ew mayewe û li ber ewey nawî

Beşê yekem ew ji bal Dr. Maruf Xeznedar û Beşê duwem ew ji bal Dr. Kemal Mezher ji Rusî ji bona Zimanê Erebi hatîye biwergerandin. Min ev wergerandina Kurdî li ser wergerandina Erebi daye bikirin.

Ez di xwazim li vê derê de bi dil û can ve sipasî van herdu Mirovan li ser vê kirina karê hanêyî bi nerx û pir giranbuha ve bidim bikirin.

Herwehaji vê carê jî nala hercar jî bi neçarî ve ez ji Xwendevan û Rexnevanan hêvîya lêbuhurandinê li ser hemû kur û kêmanîyên vê wergerandina hanê de ji bona zimanê me didim bidaxwazkirin.

Min ev Wergerandina hanê ji bona Zimanê meyî Dê date biwergerandin, da ku Zimanê meyî xweş û perest pê bête bipêşvexistin û Gelê Kurd li ser rûpelên mêjûwa xwe de bêtir pê bête biagehdarîkirin û bişiyarkirin.

Gava ku Merov vê Nivîsta hanê bi herdu beşên wê ve ji xwe re dide bixwendin, weha rûpelekî tariyî veşartî bi Sedan sal ve li ser gundwa kurdîyî poşandî de jiber çavên Merov tête dutakirin û bitarûmarkirin; jiber ku ev karê hanê ji bal yekekî ji gewretirîn û karnastirîn Rojhilatnasên gundvanên vê Serdema me hatîye bitomarkirin. Wî nebes tenê rûpelên poşandî li ser gundwa me de dayite bihilanîn, lêbelêjî bersivên pir bi nerx, hêja ve û bêjimar hêjbêtir li ser bingehê zanistîyê de li ser pir pirsên bê bersiv de di mêjûwa me de û herwehaji di vê deme me jî de dayite bidan. Ev karê hanêyî biçûk bi saya Minoriskî ve kêreke xweyî pir zanistîyî mezin di dû xwe de dayite bihiştin. Ev li ser tevaya me Kurdan

Tewfîq Wehbî û hîc kesekitir li ser nebû we, êtir we hisabkirawe ke Mîriskî nûsîtewe.

Le helkewtik de korê zanyarîyî Kur le Begda em base dest kewt we goryanewe bi ser zimanê Erebi we bilawyankirdutew. Le deway belawkirdinewe mustefa Nerîman witareki le rojnemey „Hawkari“ Begdad de belawkirdewe û em rastîye pêşya da, ke baseke hê Tewfîq Wehbîye û hê Minoriskî niye, le witareke de Mustefa Nerîman ewey pêşan dawê ke le katêk de le Lenden bowe û em rastîye le Tewfîq Wehbî xoyî bihistuwe.

Min bo ewye em rastî derxist çunke mêjû wedibê rastî bê“

dide bipêwistkirin, ku em pir bi hûrî, wîrdî û kûrî ve vî karê hanê ji xwe re bidin bixwendin û biliberketin; jiber jê em dikarin pir di mêjûwa xwe de û hêjbêtir di xebata xwe de ji bona Serxwebûna xwe bêtin biliberketin.

Xebata me ji bona Rizgarkirina Welatê me û Azadîkirina Miletê me nayête biserketin, ger ku em bi başî û bi rêk û pêkî ve li ber tevaya mêjûwa xwe de neyêtin bikevtin. Miletêkî bê mêjû mîna Menalekî bê serpêhatî tête bidîtin.

Biserketina xebata me li ser me dide bineçarkirin, ku em şev û rojê divê di tevaya gundwa xwe de û herwehaji di tevaya mêjûwa dorhêla xwe de bêtin biliberkevtin. Divê em xwe bi xwe bidin binaskirin, ger ku em jî ji xwe re bixwazin, ku belê em jî nala Miletêkî Azad di nava kurdistana xwe de bi serbestî, serfirazî, bi xweşî û bextiyarî ve bêtin bijiyandin.

Tevaya Bedbextiya me, perçekirina Kurdistanê me, talankirina dewlemendiya Welatê me û bi serdeji hêjbêtir kole û bendekirina Miletê me bi carekê ve di Nezanîya me de tête bidîtin. Ev rastiya tirş û tal li ser Zanevanên Kurd de dide bipêwist û bineçarkirin, ku ew şev û rojê ji bona pêşvexistina Zimanê me û şiyarkirina Miletê me bidin bikeftileft û bixebatkin.

Çarekirina Pirsîyariya Kurd di Rojhilata Navîn de li ser berjewendiya Gelê Kurdistanê de bi darê çu ve dê bête biçarekirin.

Perçekirina Welatê me, talankirin, raw û rûtkirina Dewlemendiya Kurdistanê me û hêjî bi serdeji ve kole û bendekirina Miletê me ji bal Borcuwaziya Turkî, Farisî û ya Erebi jî de gewretirîn metirsîyê ne bes tenê ew li ser berjewendiya Gelê Kurdistanê de dide bipeydakirin, herwehaji pêrejî û ligelji ew berjewendiya Miletê Turk, yên Îranî û yê Erebi jî bi ber tirsê ve dide bixistin.

Miletêkî Azad Miletêkî din jêrdestê xwe nade bikirin. Azadiya Miletê Kurd û pêşvexistina wî bi Azadî û pêşvexistina van Miletên hanê ve tête bigirêdan û herwehaji pêrejî Azadî û pêşvexistina van Miletên hanê jî ew bi xwe jî ve bi Azadî û pêşvexistina me Kurdan ve jî bi xwe jî ve tête vegirêdan. Weha tevaya gundwa me û

rastîya jînê bi xwe jî ve bi diyarî vê rastîya hanê jî bi hemû tîrş û talbûnên xwe ve jî ji me tevan re dide biderxistin.

Tevî hemû dirbûn û hovîtiya Serdarîkirina Turkî, Farisî û Erebî jî Dostaniya van Miletan ji me re û ya me jî ji wan re tevaya dilsozî û zanebûna me û ya wan jî ji bona Welat û Miletên me û bextiyarî û xweşîya me tevan dide biderxistin. Li ser me kurdan divê ku em şev û rojê Miletê xwe li ser vê Dostaniya hanê de bidin biperwerdekirin; jiber bes û bi tenha ve em ji Miletê xwe didin hezkirin û em ji dil û can dixwazin, ku Miletê me jî nala hemû van Miletên din li vê Cîhana me jî de bi xweşî û bextiyarî ve di nava Kurdistanê xwe de bête bijîyandin. Li ser vê jî de diyê ku em her û her Miletê xwe li ser rêya azadiyê û serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe de, li ser vê dilsoziyê de bidin bilibêrxistin û bişiyarkirin.

Di dabeşkirina kurdistanê me de di nava Serdarîkirina Turkan, Ereban û Farisan de tevaya bedbextîya me û herwehaji ligelji bedbextîya Miletên Îranî, Turkî û Erebî jî tete biditin. Ev bi xwe jî ve li ser me de dide bineçarîkirin, ku em şev û rojê vê rastîya hanê jî ji bona Miletên Îranî, Turkî û Erebî jî bidin bidîyarkirin. Bi vî rengê hanê ve û xebat li ser vê rêya hanê de dê gorîyên gihandina ermanca me di Serxwebûna Kurdistanê de û di pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe de bêtin bikêmkirin û dema gihandina wê dê bête bikurtîkirin.

Xebata Miletê Kurd di vê pêla me de, belê di piştî avêtina Çekên Kimyawî û Biyolocî de ji bona nava Kurdistanê Îraqê bi qonaxeke nuhî xwe ve li seranserî kurdistanê de hatiye vegihaştin.

Di vê qonaxa nuhî hanê de bi neçarî ve şeweyê Şerê Kurd bi hezaran sal ve duçarî veguhertina xwe tete bikin û pêrejî bi neçarî ve şeweyê sîtratîciya kurdîyî siyasî jî û şeweyî rêxistina wîyî siyasî jî duçarî veguhertinê tete bikin. Ev jî tevî jî bi hemû tîrşbûn û talbûnên jînêyî nehajî ve li nava Kurdistanê me jî de, Xebata Miletê Kurd li seranserî Kurdistanê de ji bona Serxwebûnê û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe dide biyekkirin û pêrejî bi serdejî ve ew bingehe vê xebatê û bi serketina wêna ve ji Kurdistanê Turkî dide hîmkirin û bidestpêkirin.

Weha bi vî rengê hanê ve Hîmkirin û Bingehkirina biserketina Xebata me li Kurdistanê Turkî de û ji Kurdistanê Turkî tevaya rastîya jînê ji me re vê dide bipêwistkirin, ku em ji her kat bêtir ala dostaniyê di nava Miletê Kurd de li seranserê Kurdistanê de û Miletê Turk de bi dilsozî û hêjbêtir bi zanebûn ve divê bidin biberz û bibalakirin.

Ev rastîya hanê kêseke mêjûyîyî mezin li ser ronahîya pêşketina dema me de û hêzên kêrkirî di Rojhilata me de û herwehaji di vê Cîhana me de ji me Kurdan re dide biderxistin. Ev jî tev jî bicarekê li ser têgihiştin, zanebûn û dilzoziya me de ji bona Welat û Miletê me tete bidîtin.

Xebata Miletê Kurd bi avêtina Çekên kîmyawî ve ji bal Faşîya Ereb ve ji bona nava Kurdistanê me nayête bidawîkirin, Da ku ew Dewlemendiya Welatê me (bêtir ji 90 melyon ton Neft her sal) ji xwe re bide biraw, birût û bitalankirin û bi serdeji ve Miletê me ji xwe re di Sedsalên Bîstan jî de careke din jî mîna berê ji xwe re jî bide bikole û bibendekirin. Ev avêtina Çekên Kîmyawî ji bona nava Kurdistanê me bi malandina Xakê Kurdistanê ve ji gemara Tapanên Gurîyên, Kotîyên û Faşîyên Ereb û bi Serxwebûna Kurdistanê û pêkanîna Dewleteke Milîyî Serbixwe ve ji tevaya Dunyayê re dide birmujdekirin.

Gerjî bi avêji ma be, dê Zarok û Pîrekên Helebçe tevaya talankirina Kurdistanê me û wergirtina tola xwe ji Faşîyên, Pêxwasên, Qertelên Bexdadê bidin bisitandin.

Xebata Miletê kurd bi darê çu ve û bi hinera pêşveçûna Qanên Jînê ve dê bi Serxwebûnê û Pêkanîna Dewleteke Milîyî Yekîrtîyî Serbixwe ve di Rojhilata Navîn de bête bitac û bixelatkirin.

Aramî, Aştî, pêşveketin û geşbûna Abûrî û Civakî û xweşbûn û bextiyariya jînê di Rojhilata Navîn de nayête bidîtin, tanî ku Kurdistan neyête biyekkirin û Dewleta Milîyî Serbixwe di nava wê de neyête bidamezirandin.

Evaya bi xwe jî ve ji bona hemû Miletan Mafeyê Serûştî bi xwe ye. Ew nayête bidan, lêbelê dara Azadiyê her û her bi xwînê ve tete biavdan. Hîç gûman tede niye, ku dê Netewê Kurdî perçekirî

hêjî vê dara perest jî di nava Kurdistanê xwe de her û her jî bi xwîna baştirîn Keç û Lawên xwe ve bide biavdanîkirin; jiber ku em jî bes û bi tenha ve nala Mirovan Serbest û Azad di nava Kurdistanê xwe de dixwazin bijîn. Em naxwazin Bende û Kole di nava Welatê xwe de di vê jîna hanê de li vê dunya hanê jî de li jêrdestîya Dir û Hovan de bêtin bijîyandin.

Xwendevanên Hêja!

vaye min di nava van salên çûyî de li gora karîna û zanebûna xwe û têgihiştina xwe de ji bona Zimanê me çend ji Nivîstan ji bona Zimanê meyî şêrîn û xweş ji Zimanên Bêgane dane biwergerandin; jiber ku Kilîta Pêşveketina Xebata me û Şiyarbûna Miletê me di Serxwebûn û Pêkanîna Dewleteke Miliyî Serbixwe de di pêşveketina Zimanê me de tete biditin.

Zimanê me em ji windakirinê û nemanê dane parastin. Hebûna me, na hêjbêtir tevaya Mirovaniya me bi xwe jî ve ew di pêşveketina Zimanê me de tete biditin; jiber vê jî her û her pê Keleşên, Talankerên, Dagîrkerên kurdistanê me di pêşîya pêşî de bi hemû nobûnê ve şerê Zimanê me didin bikirin û nemana wî bi hemû konetî, kosefî, dirbûn û hovîfî ve didin bidaxwazkirin.

Ez zaro bûm, menal bûm, li nava gundê xweyî razayî li paşvemayî de bûm, di pêşîya pêşî de di jîna xwe de ez duçarî neçarî pirsîyarîya Zimanê xwe bûm.

Dêya min ez bi tûrê hevirmêşî ve ligel nan, mewîjan, xame, defter û cizû de û ligel tepikekî ji rêxê de ji bona sobê ez ji bona Hucrê dame birêkirin, da ku ez Yasîn û Quranê ji xwe re bidim bixwendin.

Gava Feqe Hesên dest bi xwendina me date bikirin, ew ligel me bi zimanekî din de dihate biaxivtin, em pê li ber nedihatîn bikevtin. Min jê bi hemû zarotiya xwe ve date bipirskirin: Feqe çima tu me bi Zimanê me nade bifêrkirin?

Wî di bin çavan re li min de date bitemaşekirin û ji me re date bigotin: Evaya Zimanê şêrînî Quranê ye, yê Erebbî ye, yê ku Xwedanê Mezin pê Quran li ser Pêxember de dayite bidaxistin û

ew ligel wî bi vî Zimanê perestî hanê ve hatîye bipeyivandin. Zimanê me çewt û xware.

Careke din min jê date bipirskirin: Çima zimanê me çewt û xwar tête bidîtin? Ew li ber dilê me de bi me ve pir xweş û şêrîn tête bidîtin. Çima Xwedanê me bi Zimanê me ve ligel me jî de nayête biaxivtin, ger ku ew jî bi xwe jî ve bi rastî jî ve bi Xwedanê me jî ve bête bidîtin?

Feqê di bin çavan re awirên xweyî tûj li min de didatin vedan û şiva xweyî xêzeranîyî ter li ser serê min de dida bihejandin, bivîzandin, bilivandin û bitewandin.

Lêbelê jî ji tirsê Dêya min jî wî newêrî bû, ew wê jî ji xwe re jî li gora dilê xwe jî de li ser serê min jî de bîne xwar. Min jî û wî jî ev dizanîbû.

Feqe Hesên danê êvarê hate mala me û tevaya çîroka min û xwe ji Dêya min re date bita û biderzîvekirin.

Dêya min ji min re li ber Feqe Hesên de ji min pirsî: ma gelo bi rastî ve te ev peyvên hanê dane bigotin?

Min rep û rast careke din jî jê re jî ji nû ve jî tevde date vegerandin.

Pepûk! pepûkî bi Dêya min ve hate bikevtin! Wê got: Feqe Lawo! Lawê min Xwedênenas hate biderketin.

Ew careke din jî ji nû ve ji bona ser Ola Bav û Kalên xweyî Yezîdî hatîye vegerandin.

Ji wê rojê û pêve navê minî Navmalîyî Liva ji bona Xwedênenas hate veguhertin.

Weha bi rastî ve Dêya min malika pêşîyî zayînêyê Xwedênenasîyê di nava nîvê mejîyê min de date bihîmkirin û bihilanîn.

Weha bi vî rengî ve tevaya zarotîya min ji min re bi hezkirin û perestkirina Zimanê me ve pê hate bipoşandin.

Weha ez zû bi saya Alfebaya Osman Sebrî ve di salên pêncî de bi dizî ve li pesarên bajarê Qamişlê de, li binarê kaviên bedena

Nisêbînê de, Paytextê kevnarî Mîtanî de, hînî xwendin û nivîsandina Zimanê me bûm.

Wehaji bi lez û bi bez jî ve bi dizî jî ve ji bona Zarok, Peye û Pîrekên gundê meyî pirî li paşvemayî jî de bi Mamostê gund ve ez hatim veguhertin. Min ew li gora zanebûna xwe de fêrî Zimanê meyî xweş, şêrîn û perest didan bikirin.

Di pişt re jî ji sala 1956 tanî sala 1959 de li bajarê Şamê de li Taxa Kurmancan de li ser Destên Osman Sebrî de em çend Xortên Kurd in bi in ve bi Zimanê Kurdî ve dihatin bifêrkirin.

Osman Sebrî bi hemû dilsozîya xwe ve em fêrî yî Zimanê xweş û şêrîn didan bikirin û hêjbêtir wî em di warên siyaset û jînê de li ser tevaya pirsîyarîya Kurd, mêjûwa wî û xebata wî de didan biperwerdekirin.

Herwehaji hêjî bi serdejî wî bi hemû sadebûn ve tevaya serpêhatîya jîna xwe ji me re dida bigotin. Me tevan ji Mamostê xwe re Apo dida bigotin.

Weha ez dixwazim wergerandina vê Nivîsta hanêyî Kurdî ji bona vî Mamostê xweyî berz bidim bipêşkeşkin.

Belkî dilê Apo hinekî, piçekî pê bidim bihênikkirin, herwehaji belkî jî ew bi Şagirtê xwe ve hinekî pê bête biserbilindkirin².

Dr. M. S. Cuma

Berlin, di çîrya pêşî de sala 1989 de

²Ev kar hanê bi yarmetî û alîkarîya Fewzî Esed, Dr. Fewzî Resul, Mizgîn, M. A. Delawî û Dr. Ciwan Cuma hatiye bikirin. Ez dixwazim, ji dil û can li ser vê yarmetî û alîkarîya wan de sipasîya xwe ji bona wan bidim bipêşkeşkin.

Derîyê Pêşî³

Da ku em Ciyografiya wî perçeyê ji Asyayê bidin binîşankirin, yê ku emê dê li ser wî de bidin bixivtin, divê li ser me dû tiştên naskirî Çiyayê Araratê û Dilava Iskenderonê bidin bibîrxistin.

Di vî Perçeyê Jêrî de ji Araratê û li ser dûrbûna du hezar Fersex de rêzên Çiyayî têtin bidirêjkin û ew ligel hev de bi rengê rast ve ji Jor ber bi Jêr de hevdû didin bigirtin, di pişt re jî ew çend rêzên Çiyayî din jî didin bipêkanin ku ew xwe ber bi jêrî Rojhilatê ve tanî Dilava Farîsî didin bipêçandin.

Weha perçê yekem ji van rêzên hanê bi navê "Rêzên Sînorê Turkî-Farîsî" ve têtin binavkirin. Ew heremê ji bona du komên Çiyayî, Gola Wanê û Ormiyê didin bidabeşkirin. Perçê duwem jê xwe tanî sînorên Turkî û Welatê Faris dide bikişandin. Ev Çiyayên berz û bala û pesarên wan, yên ku ew di navbera rêzên Çiyayên Îranî de û di Welatê Navbera herdu Çeman de têtin bikevtin, bi têgihiştina Kevnar ve bi Zagrosê têtin binavkirin. (Ez gûmandikim, ku Peyva Zagrosê ji kokeke Yunanî tete biderkevtin, ew bi xwe ve li nik Miletên Rojhilat de nayête biraskirin).

Weha Çiyayê Agrî Daxê xwe ji Araratê ber bi Jêr ve dide bikişandin. Ew xwe li piş Qafqasya de ji rêzên Çiyayên Ermenî dide bicudakirin û di pişt re jî ew xwe careke din tev li wan de dide bikirin.

³Daner kurtkirina vê gotara hanê di civîna "Civata Rojhilatnasên Rusî de" di gulana sala 1915 de date bixwendin.

Weha ger ku em berê xwe ber bi Iskenderonê ve bidin bivedan, dê emê piştî dûrbûneke kurt ji Bakurî wê de rêzên Çiyayên Dijî Torosê bibînin, yên ku ew Rûbarên Çemên Derya Reş û Welatê di nava herdu Çeman de didin biparvekirin. Lêbelê Berê Giştîyî Beramberî Toros ber bi Jorî-Rojhilat ve ew di Sê Semtan de: di Jorî de, di Naverast de, di Torosê Ermînya Jêrî de, ber bi Faris, Mako û Araratê ve têtê bidîtin⁴.

Kanîyên bingehîyî Çemê Furatê di nava wan Dolan de têtin bikevtin, yên ku ew bi Rêzên Beramberî Torosê ve têtin vegihaştin. Ew ji Du Çeman têtê bipêkhatin. Yê Yekem "Muradsû" yê ku ew bigir ji Araratê ji Dola Alaşkurt dide bidestpêkirin, Yê Duwem "Qeresû" yanî "Furat" ⁵, yê ku ew ji Erzeromê têtê biderketin.

Çavîyên Çemê Arasê di navbera van herdu Çeman de û li ser rêzên Çiyayê "Bingolê" de têtin bikevtin. Ew bi rengê serûvaja ve ber bi Jor ve têtê biherikandin. Lêbelê Muradçay û Furat ew di pêşî de berê xwe ber bi Jêrî-Rojavayî ve didin bidan. Weha Muradçay li cihekî de ji cihan xwe nêzikî Kanîyên Dicle dide bikirin, lêbelê jî ew nikare wî diwarê tenik jî li ber xwe de bide bibirîn. Weha bi vî rengî ve çarenûsa wî li dorhêla Xarpûtê de têtê binîşankirin û ew tev li Qeresû de têtê bikirin. Weha piştî bi yekbûna van herdu Çeman ve li Rojhilata Navînê de gewretirîn Çem têtê bipêkhatin, ku ew jî Furat (2670 Fersex) bi xwe ye, yê ku ew dixwaze, ku ew ji bona Derya Sipî bête bikevtin.

Weha ew berê xwe ber bi Jêrî-Rojava ve dide bivekirin, lêbelê Toros rê li ber de dide bigirtin. Weha ew berê xwe ber bi Rojhilatê ve dide bivekirin û di Kendava Farisî de têtê bidawîkirin.

⁴Rêza çiya ji Bakûr ji bona Saganlog berê xwe dide bivekirin, ya ku ew piştî cenga vê dawîyê hate binavûdengkirin. Lêbelê rêza Jêrî çiyê ligel Agrî Daxê bi yek dibin. Lê ya navînî Ala Dax ew ji bona agirpijê bêdeng Tanderûk xwe dide bidirêjkirin, ya ku ew li ser sînorên Farisî nêzikî de ji Mako -Dorhêla Awacik- têtê bikevtin.

⁵Koka peyva "Furatê" ligel peyva Rusîyî Gelêrî "Fart, Pofartîlo" bi yek dibin. Ew bi Zimanên Samî (Erebî yanî yên din) ve "Pirbûn, Dewlemend, Dagirtî" dide biderxistin.

Lêbelê Rêza Duwem, ya ku ew xwe ber bi Jêrî-Rojhilatî Isenkenderonê ve dide bikişandin, ya ku ew lipêhevçûne ji bona Çiyayên Jorî Surî bi xwe ye, ew bi navê Rêzên Toros tête binavkirin. Ew xwe bi rengeki xweser xwe ve ber bi Rojhilat ve dide bikişandin û li nêzîka Gola Wanê de Rêzek xwe jê ber bi Jor ve dide bicudakirin û ya din dev ji Gola wanê ji Jêr û ji Rojhilat de xwe dide biberdan. Ew xwe li dorhêla Kotura û Rojhilatî wanê de nêzîkî sînorê Faris dide bikirin. Ew avgîra vê gola hanê ji beşên bilindî Zabê Mezin dide bicudakirin (li yên tîn ji xwe re bide bitemaşekirin). Ev Rêza dawî xwe ber bi Jêr ve dide bikişandin û ew Du Rêzên nuhî pirî bilind dide bipêkanîn, ku ew avgîra beşên bilind ji Çemê Diclê didin bihimbêzkirin û ew berê xwe ber bi Jêrî-Rojhilat ve didin bivekirin. Lêbelê Çemê Diclê berî ku ew xwe ji nava deştan bide biderxistin, ew heremên kêmtir ji Çemê Furatê bi ber xwe ve dide bixistin. Çiyayê "Cûdî" li nik kenarê çepî Çemê Diclê de tête bikevtin. Weha li ser Avsanên Rojhilatî de dibêjin, ku Nûh li ser de hatiye bdakevtin. Lêbelê Çiyayên Çolemêrgê ji wî bilindtirin û ew li pesarê çepê Rûbarê Dicle û Zabê Mezin de⁶, yê ku ew bi beşên bilindî Diclê ve nayête bigihaştin, lêbelê ew di nava rasta wî de pê tête bigihaştin, têtin biketin.

Ger ku perçên bilind ji Çemê Furat û heremên Gola Wanê (Erministana Kevnar) ew bi xwe ve Cih yanî "erdê" kevnarî be, yê ku Kurd li ser wê de hatiye biderketin, weha jî perçên Jêrî Torosê û kenarên Diclê yên çep (Botan, Xarpût û Zabê Mezin) bi xwe ve ew Welatê Zikmakîyî Miletê Kurd di Heyamên gundîyî de bi xwe ye. Weha ez bawerdikim.

Ger ku em bixwazin, da ku em li Welatê Kurdan de di destpêkirina gundwê de lê bêtin bigerandin, li ser me de divê ku em xwe ji bona nava perçên Rojhilatîyî dûr û yên Jêrî bidin bixistin. Ev Hersên heremên tîn: Rêzên Çiyayî Bilind li Erministanê, Kurdistana Turkî û Çiyayên Farisîyî Rojavayî de ew bi xwe ve Welatê Kurdanin.

⁶Peyva "Dîglatî" Babîlî "Kenarê Bilind" dide biderxistin. lê Yunanîyan ji xwe re didan bibawerkirin, ku peyv bi xwe ve ew Farisî ye, û ew ji -Tîgra-ji peyva Farisîyî nuh "Tîr" tête derketin-.

Weha bi vî rengî ve em dibînin, ku Kurd di dema niha de li ser erdekî fireh de li nik sînoren Turkî û Farisî de ji bajarê Mendelî (ji Rojhilatî Bexdadê) tanî Aratê dijîn. Weha erdê wan sînorê me jî ber xwe dide bivegirtin û ew xwe ji bona nava Qefqasya jî dide bikişandin. Kurd ligel Ermenîyan de di tevaya hêlên Rêzên Çiyayên Erministanê de dijîn û sînoren wanî Jêrî li Turkîyê de beramberî Erzeromê tete bidawîkirin. Li Jêr Kurd de heremên fireh tanî dawîya Deştên di nava herdu Çeman de ji xwe re didin bivegirtin. Di Rojava de sînoren wan Çemê Furatê bi xwe ye û bi rengê hûrtir ve Qeresû bi xwe ye. Ew bi xwe ve li nik vî sînorê hanjî de nehatine birawestandin, lêbelê jî wan daye bidestpêkirin, ku ew xwe ji bona nava Asya Biçûk jî bidin birakişandin. Ew ne bes bi tenê ve heremên Jêrî-Rojhilatîyî Sîwasê jî ji xwe re didin bivegirtin, lêbelê jî Komên wanî cuda jî xwe li dorhêla Qonya de û li Kilîkya jî de didin biditin. Weha bi vî rengî jî ve ew xwe bi Derya Sipî jî ve didin bivegihaştin.

Weha bi giştî ve em dikarin bibêjin, ku Kurd û Çiyan ji hev nayêtin bicudakirin. Her gava ku deşt destpê didin bikirin, Kurd erd ji Erebo û Turkan re û li nêzîka Gola Wanê jî de ji bona Ermenîyan re didin bihiştin.

Lêbelê li gora Serpereştîyê de Kurd li van heremên têtin de têtin bineşînkirin:

Li Rusya de

Kurd li Melbenda Yerîvanê de di perçên, ku ew bi Araratê ve têtin bivegihaştin, têtin birûniştin. Herwehaji ew li heremên cudaji de ji Hêlên erdeghan, Qazman li herema Farisê jî de rûdinên. Bi serdeji Kurd herwehaji li herema Zengezor û Ciwanşêr -Arş û Cibrayîl- jî li Melbenda Ilizabês Pol de dijîn. Li vir de divê bête bigotin, ku Kurdên van heremên hanê jî ew ne mîna kurdan di Serjimara Xelkêyî vê dawîyê de hatine bitomarkirin. Weha Serjimara Kurdan li Yerîvanê û Qarsê de di sala 1910 de 125. 000 Kes bûn, ji wan 25. 000 Kes Yezidî bûn.

Li Faris de

Kurd li hemû perçên Melbendên Kermenşah û Kurdistan de - Senendec-, li Garus, li perçeyekî ji Ezerbêcanê de, li hemû heremên Sawçeplaxê -Mehebad Cuma- de ji Jêrî Gola Ormîyê, ji Rojavayî Çemê Tataw, ji Xêza dirêjkirî li ser dûrbûneke dirêj de li ser sînoren Turkî de di perçên Jêrî de ji Ormîyê, ji Selmasê, ji Xoyê û Mako rûdinên⁷. Kurdên Îranê Xelkên Kevnar di perçên Jêrî de didin bipêkanîn.

Ez bawerim, ku ew xweser ji Zarokên Mêdîyên kevnarin, yên ku ew di nava van heremên Rojavayî de ji vî Welatî hanê hatine bijîyandin.

Lêbelê Kurdên, yên ku ew li perçên Jêrîyî Rojhilatî de rûdinên, ew di Ziman û Oldariyê de Ew bi xwe Şîne, Alî Xwedanîne ji Cemawerên din têtin bicudakirin, ligel wanên ku ew bi hev re jî ji yek Bunyadê têtin bidîtin; jiber ku ew bi xwe ve li ser sorin, ku ew tev de bi hev re ji yek Miletî têtin bidîtin. Lêbelê der barê perçeyên Jorî ji Faris de divê em ji bona nimûne bibêjin, ku di Sedsalên Zayînêyî pêşî de Selmas⁸ Melbendeke Serbixwe dida bipêkanîn û Ermenîya ew bi navê "Kurtçîya" ve bi têgihştina "Kurdistanê" didan binavkirin. Lêbelê di babetî perçên Jêrî de ji Gola Ormîyê Kurd têde demeke derengtir tanî endazekî hatin birûniştin. Weha li herema Sawçeplaxê de hêjî navên Turkî tanî nihajî pir jî têtin bidîtin⁹. Bi servêdejî ve kaniyên Kurdan bi rengekî pir diyar ve didin biderxistin, ku Xuyabûna Eşîrên Mokrî Merovên Eşîra Baban li Sulêmanîyê de di pêla Serdariya Berxê Reş û Sipî de, yanî nêzîka Sedsalê Panzdehan ji Zayînê hatine bidîtin. Tevî li wan heremên binavkirî de ji yên ku ew bi carekê xurû ve nala

⁷Mîrşîniya Awacîk bi xwe ve ew herema bi tenha ye, ya ku têde Turk ligel "Êla Eyromilî û yên din" de ji Kurdan li ser sînora berberîyê didin bikirin, ji yên ku ew heremên xurûyî Kurdî têtin bidîtin.

⁸Odontis Erministan di pêla Costmîsan de, R.418 "bi Zimanî Rusî ve".

⁹Bi rastî pir cudabûn di nava wan navên Turkî û Kurdî de, yên ku ew tèn, têtin bidîtin: Pîjaw, Dolkan, Kanî Sîman, Gertek Sipî, Zarkîyo hd...

heremên Kurdî têtin bidîtin, herwehaji li Welatê Faris ji de Avedaniyên Kurdîyî belavkirî di heremên cuda de:

Li Xuresanê Şadilî de, li perçên Jorî ji Qezwînê de Emîlo û li dorhêla Şîrazê de (Kalon Ebdo) têtin bipeydakirin; jiber ku ew ji bal Nadir Şah -1736-1737- de bi darê zorê ve hatin bibarkirin.

Li Turkîyê de

Kurd bi rengêkî bingeşî ve li Wilayeta Musilê de dijîn. Ew bi xwe ve heremeke Kurdîyî xurû ye. Lêbelê di Wilayetên Wan û Bedlîsê de Ermenî piranîyê 60-70% didin bipêkanîn Evaya ji bi erdên dorhêla Gola Wanê ve tête bigirêdan; jiber têde pir av tête bipeydakirin. Lêbelê li Sinceqa Hekarê de, ya ku ew tanî sînorê Farisî xwe dide bikişandin û herwehaji li perçên pirî dinîjî de ji heremên çiyayî li wan herdu Wilayetan ji de piranî ji Kurdan tête bidîtin, Êlên Aşûrî li Jêrî Hekarê Çolemêrgê de di heremeke biçûkî de li ser xwe girtî de dijîn. Ew li wê derê de 90% ji Xelkê didin bipêkanîn û ew li ser Zînetê de zalin.

Kurd li Wilayetên Diyarbekir û Xarpûtê de ji hemû Miletên din bêtir jimarîn. Weha bajarê Cezîrê li Wilayeta Diyarbekrê de li ser kenarê Çemê Dîclê de li herema Botan de¹⁰ tête bikevtin. Ew nala Dergûşa Netewê Kurd tête biderketin, jê ew hatin bibelavkirin û têde ji Tevgera Miliyî Kurdî ji serê xwe date biberzkin. Lêbelê der barê Wilayeta Xarpûtê de, hîç gûman têde niye, li ser me de divê, ku em li ser Xelkên herema Dêrsimê de bidin bipeyivandin, ya ku ew di navbera Herdû Çeman de tête bikevtin, yên ku Furat ji wan tête bipêkhatin, Kurd di vê herema hanê de piranîyê bi Heşt Caran ve beramber bi Xelkên Nekurd ve didin bipêkanîn. Ew bi Zimanê Kurdî ve, lêbelê bi Zaravayê "Zaza"¹¹ ve didin biaxivtin û

¹⁰Ev herema hanê ji cihên pir fireh ji beşên xwarî ji Deştê Botan tête pêkhatin. Ev bi xwe heremeke Serpereştî nade pêkanîn, mîna ku M. Hartman dida bawerkirin. Lêbelê ew di nava sê Wilayetan de hatiye bidabeşkirin.

¹¹Ez gûmandikim, ku Zaravayê Zazan navekî wergirtî ye. Ev navê hanê li ser wî Zimanê hanêyî dorhêlêyî nenas de tête bikirin. Ev Zaravayê hanê -li gora lêgerandinên nuh de ji bal Oskar Man de- Îraniyî xurû ye. Ew bi xwe ve bi Binemala wan Zaravan ve ji bona nimûne mîna Goranî ve tête bigihaştin. Ji

Oldarîyeke wanî taybetî heye; jiber vêjî Hinekan ji xwe re dane bibawerkin, ku ew ne Kurdin. Lêbelê ez bawermendim, ku ev Dîtina hanê ne rast tête bidîtin; jiber ku ew bi Zimanê Kurdî ve didin biaxivtin, yê ku ew ji bona Zaravan hatîye biparvekin.

Herwehaji Mirêsên Jîyana wan jî Kurdî bi xwe ye û Oldariya wanî Alî Xwedanî pê Eşîrên Kurdayî din jî didin bibawerkin. Serjimara Kurdan di Wilayeta Helebê de ji Serjimara Ereban kêmtir tête bidîtin.

Ragiyandinên nuh, yên ku Şahbender Tisîmerman date bipêşkeşkin, didin bidiyarkin, ku ji tevaya 125.000 Kes ji vê Wilayetê têde 1000 gundên kurdan têtin bidîtin. Li Wilayeta Sîwasê de Kurd Kêmbûneke Milî didin bipêkanîn. Serjimara wan bi 1000 Kesî ve tête bitexmînkirin -Şahbender Savînov-. Li Wilayeta Erzeromê de, li perçeyên Jêriyî-Rojhilatî de jê Kurd Piraniya pîrbûnê Beramber bi Xelkên din ve didin bipêkanîn -Kurd 300.000, Ermenî 200. 000 û Turk 110. 000- "Şahbenderê Giştî Ademov". Herwehaji li Sînceqa Beyazîdê de Kurd pîrbûnê bi Pênc Carî ji Miletên din bêtir didin bipêkanîn -Lênc-.

Herwehaji Avedaniyên Kurdayî cudaji li Suriyê de li ser pesarên Çiyayên Şamê jî de têtin bidîtin û di nava wan jî de Firoşgehên Kurdî jî têtin bipeydakirin -M. Hartman-.

Li Bexdadê de Serjimara Kurdan 5000 Kes -Instas Marî- têtin biderketin, ew ligel Ereban de tevlihevin. Herwehaji hin ji Eşîrên Kurdiyên din Zengene, Delo... ûhd.. ew li perçeyên Rojhilatî de ji Rêya Bexdadê û Iranê dijîn -Şahbenderê Giştî Orlov-.

Sermijara Giştî ji bona Kurdên li Turkî de nêzîka 1.700.000 Kes têtin biderketin (Evriyanov).

Weha ger ku em Serjimara wan li Farisê de bi nêzîka Yek Milyon Kes bidin bidanîn, weha dê Serjimara Kurdan bi Giştî ve bi rengekî texmînkirî ve di nava wan jî de Kurdên li Rusya jî de nêzîka Du Melyon û Nîv tanî Sê Melyonan bêtin biderketin.

Weha divê bête bigotin, ku pêrabûna yekane ji bona dana wêneyekî Etnogirafiya giştî ji bona Welatê Kurdan ew bi xwe ve

bona wê rûçikên wêyî taybetî têtin bidîtin. Weha divê ji ser balên me ji me re neyete biwindakirin, ku Evsana pêwendîya vî Zaravayê hanê ligel Ermenî de hîç bingeh jê re nayete bidîtin.

Neqşa Serheng Kartisov bi xwe ye. Ew bi xwe ve, weke ku ez bawerim, li Rojava de ne bi nav û deng ve tête bidîtin¹². ew bi xwe jî ve jiber hoyên teknîkîyî xurû nikare bête bikaranîn; jiber vê jî em dikarin ji dêlva wêna jî Neqşeke din ji bona raxistina heremên Kurdan bidin bikaranîn, ji yên ku ew li Turkîyê de rûdinin. Ew Neqşa hanê jî bi xwe ve di Nivîsta Endamê Civata Giştîyî Birîtani de Mark Sayiks de hatiye bibelavkirin¹³, yê ku ew bi xwe ve ji Karşinasên Etnogirafiya Kurdî û nemaze li ser Kurdên Turkî de bi taybetî ve tête bidîtin.

Herwehaji ragiyandinên amariyî pirî din li ser Eremenîyan, Kurdan û yên din de di Belgeyên Mîrîyî ji Belavokên Wizareta Derveyî "Rastkirinên li Erministanê de" 1915 de hatine bibelavkirin.

¹²Rûnkirinên li ser Kurdan de, di "Tomara Beşe Qefqasî de ji Civata Ciyografiyî Şahînsahîyî Rusî de", sala 1897 de, R. 339-368 de, bi "Zimanê Rusî" ve. Têde agehdariyên pirî dewlemend li ser kurdan de têtin bidîtin. Lêbelê Neqşa heremên, yên ku Ermenî di nava wan de dijîn, ne bi rastî tête bidîtin. Herwehaji Daner bi tu corekî ve li ser Avedaniya Jêrîyî Kurdan de pê nade binîşankirin. Herwehaji ew ji bona heremên Alî Îlahên Îranî jî bi rengekî rast jî ve pê nade binîşankirin. Herwehaji ew pirî caran jî navên Êlan bi Zimanê Rusî jî ve bi şaşî ve dide bitomarkirin û wan li cihên wan de nade bidanîn. Lêbelêji tevliwêji ev Neqşa hanê jî bi xwe ve ew karekî pirî mezin bû û wê hêji giringbûna xwe jî nedaye biwindakirin.

¹³Êlên Kurd di Şahînsahîya Osmanî de, kovara Patîşahîyî Asyayî, Jimara 38, sala 1904, R. 451-486 bi Zimanê Ingilîz ve. Hîç gûman lénayête bikirin, ku ev karê hanê bi çapkirineke wîyî nuhî rastkirî ve ligel nivîsandina hemû Kaniyên heyî de li ser kurdan de di vî babetê hanê de tête bipêwistkirin. Weha şeweyê likarxistin û rêxistina Neqşê bi diyarî ve dide bixuyanîkirin, ku Daner xwestî ye, ku ew ji bona bicihanînê ye. Weha Êl li ser Pênc heremên Ciyografiyî xurû de hatine bibelavkirin, yên ku Daner bi Tipên mezin ve bi wan dide binîşankirin. Lêbelê cihê rûniştina van Êlên hanê bi Tipên biçûk ve hatine binîşankirin. Herwehaji ji bona bikaranîna Neqşê Tabloyekî -Xaneke- bi dûr û dirêjî ve li ser Êlan de tête bidîtin. Em bawerin, ku ew Neqşa hanê dikare ji bona nişankirina wan hereman bête bikaranîn, ji yên ku bes û bi tenha ve kurd di nava wan de têtin bijiyandin. Lêbelê Aşûrî bi Xaç ve têtin binîşankirin û Ermenî bi xwe ve bi carekî ve têde nayêtin binavkirin. Weha divê bête bigotin, ku Neqşa Serheng Kartisov di vî warê han de bi gelekî ve baştir tête bidîtin. Li ser me de divê, ku em di navbera M. Saykis û T. M. Saykis Şahbenderê Giştî li Meşhedê de û Danerê Nivîsta "Deh Hezar Mîl li Farisê de" tevlihev nedin bikirin.

Derîyê Duwem

Mêjûwa Kurd

Koka Kurdan yanî bi gotineke hêjî hûrtir ve Peydabûna wanî pêşî li Kurdistanê de nala pirsîyarîyekê tête bidîtin, ku hêjî li dora wê de gift û go têtin bigerandin û li ser wê jî de hêjî bîr û bawerîyên dijîbihev têtin biderketin. Nivîsyanên Kilasîkî¹⁴ navên pir didin bianîn, yên ku ew bi rengekî pir hûr ve nala peyva Kurd têtin biderketin, gava ku ew li ser Xakê Kurdistanê niha de didin bipeyivandin. Weha bi vî rengî ve tanî demeke kurt jî bi nav û deng bû, ku Kurd ji Nevîyên Kardoxan têtin bidîtin, yên ku Zeynefon ew dîtibûn û wî ligel wan de di sala 401 de Berî Zayînê dabû û sitendibû, gava ku wî Rêberîya Deh Hezar Yunanî dida bikirin. Weha ev bîr û bawerîya hanê di vê dema dawî de hate biveguhertin; jiber hinek ji Zanistvanên niha wan Miletan ji hev didin bidubeşkirin, yên ku ligel wan navên bi bîrxistî ve pêwendîyê didin bikirin: Beşê Yekem bi taybetî ve Kardox li ser wan de tête bigotin, ku ew ne ji Kokeke Arî têtin bidîtin¹⁵, lêbelê

¹⁴Ez bawerim, ku pîrsa hatina Navê kurd di belgeyên mûjûyîyî kevnar de hêjî nehatîye biçarekiin. Navê kevnî "Kurtî" nehayê "Korxî" tête biderketin, (li Hartman, Botan Beşê Duwem de, R. 92 bide bitemaşekirin).

¹⁵Akadîmî Mar dide bawerkirin, ku navê "Kardoxî" dide bixuyanîkirin, ku Bejna vî Miletê hanê ligel Orartan de, yên ku wan xwe bi Xalîdan de didan biderxistin, ji yek Kokê dide biderxistin. Wehî Zimanê wanî kevin jî xwe bi carekê ve ji bingehe xwe di pişt re bi Zimanekî Hindo-Ewropî ve xwe date biveguhertin (li "careke din li ser peyva Çelebî" de ji tomarên Beşê Rojhilatî di Civata Şopên Şahînsahîya Rusî de, sala 1913 de, Bergê 20, R. 139 de "bi Zimanê Rusî" bidebi temaşekirin). Lêbelê li ser pêwendîya Kurtîyan de ligel Kardoxan Mar weha ji xwe re dibîne, ku ew ji tiştên pir dujwar tête biderketin, ji yên ku li ser wê de bête bidadkirin.

Kortîyîn, yên ku ew li perçê Rojhilat de li Welatê Kardoxan de dijîn, ew bi xwe jî ve ji Bavpîrên Kurdan têtin bidîtin. Weha bi vî rengî ve heger jî çi be, ev Miletê hanê, yê ku em li ser wî de didin binivîsandin, ew bi xwe ve li çiyayên Kurdistanê de Berî Zayînê bi çend Sedsalan ve hatîye bidîtin.

Weha em bi pir başî ve dizanin, ku ne bes tenê Kurd ji bal Zimanê xwe de Arî têtin bidîtin, lêbelê jî hêjbêtir jî ku Zimanê wan bi xwe jî ve di nava Binemala Zimanê Arî jî de tete bikevtin. Wehajî li ser vî bingehe hanê jî de Welatê wan û herwehaji Zimanê wan jî li gora bîr û bawerîya min de di Rojhilat de¹⁶ têtin bidîtin.

Gava ku em bizanibin, ku Pêla Yekem ji Barkirina Arîyan nêzîka destpêkirina Sedsalê Heftan Berî Zayînê hatîye bidestpêkirin, wê çaxê dikare pê bête bîbawerkirin, na hêjbêtir divê bê li ser wê de bête bisorkirin, ku di vê dema hanê de, ya ku tede Mîdîyan ligel Hevalbendên xwe de di sala 607 de B. Z. -Berî Zayînê- Aşûr dane binabûdkirin, jimarên pir ji Kurdan ber bi Rojava de xwe dane bikişandin.

Weha divê li vir de bête binîşandan, ku nêzîktirîn û kevintirîn Dirawsê wan bi xwe ve Ermenî bûn, yên ku ew jî di vê dema hanê jî de bi xwe ve li Firîgya de hatin biderketin û wan ji xwe re Keyetîya Orarto¹⁷ dane bivegirtin. "Ew Miletê jî Binyadekî din tete bidîtin" û wan Keyetîya xwe li Dorhêla Gola Wanê de datin biavakirin¹⁸.

¹⁶Weha tete bawerkirin, ku Barkirinên giştîyî Arîyan ji bona Îranê ji Rojhilat ber bi Rojava ve hatine bikirin. V. V. Bartold, Raxistneke Ciyografi-Mêjûyî ji bona Îranê, 1903, R. 3, 59, "bi Zimanê Rusî ve".

• ¹⁷Hin ji Zanistvanan Koka Orartan, yanî weke ku ew niha bi Xalidîyan ve têtin binavkirin, bi Binemala Orduwîyî taybetî ve bi Miletên "Hitîî, Mitani û Nehrî ve didin bigirêdan". B. A. Torayêv, Mêjûwa Rojhilata Kevnar, Bergê Duwem, 1914, R. 46 û yê tîn "bi Zimanê Rusî ve" bide bitemaşekirin.

¹⁸Hin Dîtinên din dibêjin, ku pêwendî di navbera Ermenîyan, Hitîtan û Kêmîrîyan de hatîye dîtin. (Li Xalanyanits, li ser gundwa Erministanê, 1910, R. 10-20) "bi Zimanê Rusî" bide temaşekirin.

Weha li ser vî bingehê hanê de em dibînin, heger ku Koka Ermenîyan ji Jêrî-Rojavayî bête bidîtin, weha Koka Kurdan ji Rojhilat tête bidîtin.

Weha bi vî rengî ve herdu Pêlan Tawros ji bona Du Beşan dane bibeşkirin. Weha navê Kurdan bi rengekî serbixwe ve di nava keyetîyên Farisîyî kevin de nehatîye, ev jî dibe, ku ew di nava Melbendên Ermenîyan de dihatin bidîtin.

Ciyografiyên Yunanîyî (Sitrabo, Pêtolîmî û yên din) di pêşîya Sedsalên Zayînê de bi rengekî zor baş ve heremên (Kordoyîn) nasdikirin. Weha bajarekî biçûk bi navê (Pînak) ve dihate bidîtin, ku ew hêj li ser çemê Diclê de tête bipey dakirin û ew bi navê (Fênîk) ve tête binavkirin¹⁹.

Weha niha em pêwendîya di navbera Peyva "Kordoyîn" û peyva "Korçîya" (Welatê Kurdan) de, yê ku ew ji bal Ermenîyên Arşakiyan dihate binavkirin û yê ku ew ji Selmasê û di nava Beşên Jêrî Hekarê û ji Rojava hetanî Botan²⁰ de xwe dida bidirêj kirin, dikarin bidin bibawer kirin.

Wehaji gerji çî jî cudabûn jî di Dîtinan jî de li ser çarenûsa vê Herama hanê jî de bête bidîtin, tevlivêjî rastiya li rastê de rastîyekê bi tenha xwe ve dide biderxistin, ku min ew jî ji Şarmo dayite biwergirtin, ku Beşên Jorîyî Rojhilatî ji Kurdistana Navîn xwe di bin Serdarîya Binemala Haykanê Ermenî de dida bidîtin û ew bi xwe ve biserêxwe bû û ew ji bona nava Dewleta Aximînîyan ne dihate bikevtin. Di pişt re ew ji bona Iskenderê Mezin, ji bona Ermenîyên Arşakiyan, ji bona Iskender lawê Mark Antonî, ji bona Kîlopetra, ji bona Parvîyan, ji bona Romanan, ji bona Sasanîyan

¹⁹Gerji bi piştgirtina Dîtinê ve bête bineçarkirin, ya ku ew bi hebûna cudabûnêve di navbera Kardoxan û Kurtîyan de dide bigotin, weha bi vî rengî ve divê em peyva Sitrabo nedin bijibêrakin: ku herema di dema wî de Kurduyîn bû, -ya ku têde bajarê Pinak tête bipey dakirin, ew bi xwe ve di heyamên kevnîyî kevnar de bi Welatê Kardoxan ve dihate biderkevtin. Hartman, Botan

²⁰Odontis, Erministan di Pêla Costinyan de, R 418.

(erdeşêr û Şapûr), ji bona Imperatorên Romanî ji Calêrî tanî Colyan, careke din ji bona Sasaniyan, ji bona Imperatorê Bêzentî Fiyodos, ji bona Ereban, yên ku wan Mîrmeşînîyên Ermenî dane bihêrîşkirin û di dawîya dawî jî de ji bona Binemala Pêşîyî Kurdî Merwanîyan ya serbixwe, ya ku wê ji sala 990 tanî 1096 Zayîne de date biserdarkirin, hate bindestkirin.

Di rastîyê de di nava van heremên hanê de aramî nehate bipeyda kirin û Hêrîşên Rojhilatîyî din hatin birûdan. Weha di Sedsalên Yanzdehan de Silcoqîyan herem ji xwe re dane bivegirtin, di pişt re jî Kurd hatin bineçarkirin, ku ew dijî Mexolan şerekî sext bidin bilidarxistin. Di Sedsalên Sêzdehan de Kurdan şer dijî Holako Xan û di pişt re jî dijî Têmorleng nêzîka sala 1400 Z. de, yê ku ew li Kurdistanê de li Dora Emadîyê de bi xwe hate bişikenandin, wan ew date bilidarxistin.

Weha di dawîya dawî jî de di Sedsalên Şazdehên Zayîne de hêrîşên din ji Rojava hatin biderketin, ku ew jî ji bal Turkên Osmanî ve dihatin bikirin.

Weha di sala 1514 de Sernivîşt Kurdistanê bi Osmanîyan ve hate bigirêdan.

Sultan Selîm Serpereştîya Kurdistanê piştî vegirtina wêna ji bona yê nêzîkî xwe ve gundvanê Hozanê Idrîs re pê date bîsipartin. Ew bi xwe ve ji Kurdên Bedlîsê bû²¹. Hinek didin bibawerkirin, ku Hozanê Bedlîsî Kurd ji bona heremên, yên ku Eremenî li wan de dijyan, jiber hoyên siyasî dane bibarkirin, lêbelê bi rasttir ve divê bête bigotin, ku Kurd di nava van Hêlên hanê de bi demeke dirêjtir berî vê dema hanê ew hatibûn bibelavkirin.

Lêbelê ku Beşekî ji van Êlên hanê bi xwe jî ve ew Koçer bûn, ev bi xwe jî ve rastî ye, lêbelê Beşê din ji bal Oldarîya Musulmantîyî belavkirî di nava wan heremên hanê de, yê ku wan şerê Filetîyê didan bikirin, dihate bibelavkirin. Weha li vê derê de divê bête nîvîşandin, ku Bavpîrên Selah-Edînê Mezin ew bi xwe ve ji Eşîra Rawendî bû. Wan Kon û Zomên xwe li Dora Keleha

²¹Nivîsta Şerefname, Perçê Siyem, R. 208, 315 "Çapa Pêtersburg".

Duwîn de didan bivedandin, ya ku ew di Sedsalê Dehan de bi herema Yerîvanê ve²² dihate bivegirêdan. kanîyên Kurdan dibêjin, ku Eşîra Rojkî Bedlîs û Xazo bi darê zorê ve ji Mîrê Gurcî Dawud date bisitandin. Herwehaji di nava van kanîyên hanê jî de têtê bidîtin, ku Binemalên Kurdan ji sala 873 Z. Serdarîyê didin bikin.

Ez bawerim, ku dê bi rasttir ve bête biderketin, ger Merov hin jimarên din li ser vê jimara hanê de pêbide bivekirin, yanî ku Merov bibêje, dibe, ku ev rûdanên hanê weha di Sedsalên Dehan û Yanzdehan de hatine birûdan²³.

Hîç gûman têde nîye, ku Kurdan hin ji Beşên Keyetîya Ermenî bi rengê lidûhev ve ji xwe re didan bivegirtin û weha ev vegirtina hanê di Sedsalê Yanzdehan de hate bidawîkirin. Weha bi vî rengî ve ew li pir ciyan de li ser erdê xweyî kokî de najîn, lêbelê jî divê jî ev jî ji ser bala Merov jî neyête biavêtin, ku ev pirsîyarîya hanê jî ne bi nuhî têtê bidîtin, lêbelê jî jê re jî rehên wêyî gundiî yê dirêj jî têtin bidîtin û rastîya li rastê jî de pişta vê dide bigirtin, ku Erministana kevnar di van rojên me de ji aliyê Etnografi de ew bi xwe ve Kurdî-Ermenî bi xwe ye.

Kanîya Kurdîyî Mezin û Belgeya gundiî giring Nivîsta Şerefname di dawîya Sedsalê Şazdeyê Zayînê de hate biderketin. Weha têde agehdariyên pir bi nerx ve li ser Mîrneşîniyên kurd de di pêla Serdarîkirina Sultan Selîm de têtin bidîtin.

²²Kanîya Pêşî, Perçê Duwem, R. 76.

²³Kanîya pêşî, Perçê Siyem, R. 34, 224 "Wergerandin" Em van rûdanên hanê di nava Kurdan de tanî nihajî de li Mûşê û li Kabîya Cos jî de didin bidîtin. "Li gotara Sayîks û Şarmo de di Perçê Çarem de, R. 213 de bide bitemaşekirin". Ew bi xwe ve dide bixuyanîkirin, ku Dawidê bi navkirî ve ew bi xwe ve Lawê Sênherîm bû, yê ku ew ji Mala Ermenîyî Artisironî bû, yê ku wî dev ji Textê Patîşahîyê di 1027 de berda. Lêbelê ji aliyekî din jî de belgeyên mêjûyî didin binişandan, ku yê bi navkirî ve Mîrekî Gurcî bû. Weha ger evaya wisa be, divê bête bibîrxistin, ku Dawid Kuweylat di sala 1001 de hatîye bimirin. Wiha bi vî rengî ve belgeyê mêjûyî di navbera Dawidê Ermanî û Gurcî de dide bicudakirin. Ji bona nimûne belgeya mêjûyî dide bibîrxistin, ku Kenîsa Ermenî ji bona Mizgeftê hate biveguheztin (Perçê Siyem, R. 215).

Kenarê Çepê ji Çemê Furatêyî Rojava û hemû heremên kenarên Rojhilat ji (Muradsû) bigir di bin Serdarîkirina Mîrneşîniyên Kurd de dihatin bidîtin, ji yên ku wan xwe didan binaskirin, ku ew ji Koka wan Êlan têtin biderketin, ji yên ku ew di nava van Hêlan de piştî belavbûna Oldarîya Musulmantîyê dihatin bijîyandin.

Weha Mîrneşîniya Bedlîsê ji gewretirîn Mîrneşîni dihat bidîtin û Mîrê wê ew bi xwe ve Danerê Nivîsta Şerefname bi xwe bû, yê ku wî têde bi dûr û dirêjî ve li ser Çandinîyê û Pêrabûnên Mîrneşîniya xwe de ji avakirina Mizgeft û Bazaran û li ser Zanîstvanan de hd.. dayite binivîsandin.

Herwehaji Kanî bi xwe jî ve li ser koka Kurdan de bi serbilindî û payebûn ve bi xwe jî ve pê dide binivîsandin. Ew li ser Rewest û Sinciyên wan de dide bipewivandin û ew li ser rûdanên şerên wan, koçkirinên Êlên wan û xebata wanî li dûhev de diji Turkî û Îranê dide bineqîşandin. Weha bi vî corî ve ew li ser rûdanên mêjûwê tanî roja xwe de dide bigotin.

Di Şerefname de li ser evîndariya Kurdan de ji bona Azadiyê wisa hatiye binivîsandin: "Sultanên Gewre, Mîrên Mezin nedikaribûn li ser Welat û Xakê wan de bêtin bizalkirin. Kurdan ji wan re diyarî didan bipêşkeşkirin û ew bi wan kar û baran ve radibûn, yên ku ji wan Sultanên didan bidaxwazkirin û herwehaji wan ji wan re Sipahên Hilanînê didan bipêşkeşkirin, gava ku ew pê pêwist dibûn"²⁴.

Lêbelê ev zînetê hanê di Sedsalê Nozdehan de hate bidawîkirin, gava ku Rastkirvanê Turkiyî Mezin Sultan Mehmûdê Duwem Biryara Sultan Selîm li ser kurdan de date binayînkirin, yanî bi rengê hêjî diyartir ve wî xwest, ku ew Kurdistanê ji nû ve careke din bide bivegirtin; jiber vêjî wî biryar bi pêrabûnên Sipahî ve diji wan date bidan.

Ev bi xwe jî ve jê re di sala 1834 de hate bipêkhatin. Hêrîş di bin Rêberîya Reşîd Paşa de hate bikirin. Di piştî vê re jî Kurd mîna

²⁴Kaniya pêşî, Perçê Duwem, R. 34.

Neşînvânên Patîşahîya Osmanî bi rengê xweser yanî ne xweser ve hatin bidîtin.

Herwehaji vê vegirtina hanê pêrabûna Kurdan di cara pêşîn de bi Tevgerêke Milî ve di salên 1843-1846 de di bin Rêberîya Bedirxan Paşa de date bihoyekirin, lêbelêji ew biserketinê jî nehate bipîrozkirin; jiber Serdarîya Osmanî ji bona ser Kurdan Sipahêkî pîrî gewre date birêkirin û ew bi ser wan ve bi serketî ve hate biderketin. Bi pê vê jî Bedirxan jî hate bidîlîkirin û ew ji bona Girava Kirêta hate bisorgonkirin.

Di rojên cenga Qerim -1853/56 Cuma- de Tevgerêke Gelêrîyî din di bin Rêberîya Yezdan Şêr de, ji Mirovên Bedirxan Paşa, ji yê ku ew berî niha hatiye binavkirin, hate bipeqandin.

Gava Leşkerên Turkî ji bona Bakur hatin birêkirin, da ku ew bi cengê ve dijî Rusya rabin, wê çaxê Yezdan Şêr bi Tevgera xwe li Hekarê û Botan de di sal 1855 de rabû. Wî Bedlîs û Mûsil ji xwe re dane bivegirtin û bi Jêr ve wî xwe date biserberjêrkirin. Weha wî tevaya erdên di navbera Wan û Bexdadê de ji xwe re date bivegirtin.

Şikenandina Leşkerên Turk li herema Sêrtê de pir xurt bû, wer Xelkekî pir mezin ji Karmend û Serbazên Turkan hatin bikuştin. Herwehaji divê lê bête binîşankirin, ku Tevger bi xwe ve ew hîç dijî Filan nebû, bi servajîvêjî ve Aşûrî û Yunanî jî, yên ku ew li Kurdistanê de dijyan, wan bi xwe jî ve serê xwe dane bihildan û di bin Ala Yezdan Şêr de dane bişerkirin.

Yezdan Şêr pir caran ligel Rusan de date bipêwendîkirin. Wî Peyên xwe ji bona nik wan de date birêkirin û wî ji bona wan date bipêşneyarkirin, ku ew ligel Sipahê wan de bête bitevlêkirin, lêbelêji tevlivêjî wî hîç bersîvek jî ji xwe re neda biwergirtin.

Weha berî ku em dest bi rabûnên cengê ve di Buhara sala 1855 de bidin bikirin, Yezdan Şêr li ser sozekî derewînî Xînezekî Şahbendera Ingilîzî Nemrûd Sam de²⁵ xwe date biberdestkirin.

²⁵Ew ji Xelkê heremê bû. Ew bi kolandinên xweyî pirve di nava Welatê Aşûrîyan de hate binavûdengkirin. Tuwaryêv, Mêjûwa Rojhilata kevin, 1913, Perçê yekem, R. 37, bi zimanê Rusî ve lêbide bitemaşekirin.

Weha ew hate bigirtin û ew ji bona Istenbolê hate birêkirin. Weha bi vî rengê hanê ve Tevgera wî hate bitemirandin.

Li vêderê de divê bête bibîrxistin, ku Serdarîya Osmanî bi Nişaneke taybetî ve hemû Evser û Serbaz dane bixelatkirin, ji yên ku ew di nabûdkirina vê Tevgerê de hatin bibeşdarkirin.

Lêbelê Yezdan Şêr bi xwe ve di pişt re ew nala Qehremanekî Milî hate bidîtin û bi komeke Xweşxuyan û Meqamên Kurdîyî Gelêrî ve hate bimaçînkirin. Weha Sutsin pir ji van Sitranên li ser vî Lehengê hanê de dane bitomarkirin.

Hêjî cenga 1877-1878 jî nehatibû bidawîkirin, gava ku Tevgereke din li Hekarê, Badînan Emadiyê û Botan de xwe date bideştîpêkirin. Bi Tevgerê bi xwe ve kesên Eşîrê bi xwe ve û bi taybetî ve Zarowên Bedirxan pêhatin birabûn; jiber yekek ji wan di Rêberîya Giştîyî Sipahiya Osmanî de Serheng bû.

Weha ji Armanca vê Tevgera hanê bû, ku ew careke din Serxwebûna windayî bide bivegerandin. Wehajî careke din jî ev Tevgera hanê jî li Sêrtê hate bivemirandin û Serokên Tevgerê hatin bigirtin. Weha bi vî rengê hanê ve ev pêrabûna bêhêvî hate bitemirandin.

Lêbelê Tevgera sala 1880 de ew bi xwe ve ligel Tevgerên din de xwe dide bicudakirin. Serokê wê Şêx Ubey-Dula bû, yê ku ew di nava Kurdistanê de xwedan nav, deng û rûmeteke pir giran û mezin bû. Wî yarmetîya Turkan di cenga sala 1878 de date bikirin.

Armanca vê Tevgera hanê bi xwe ve Dazanîna Serxwebûna Kurdistanê bi xwe bû. Şêx Ubey-Dula bi Tevgera xwe ve di nava Xakê Îranê de pê date bideştîpêkirin. Hêzên wî li dorhêla Urmîyê de xwe bi serhev de dabûn bikomkirin. Gola Urmîyê di nava destên wan de bû. wan Binab dane bivegertin û wan berê xwe ber bi Tebrîzê ve dane bivekirin.

Weha di nava Şeqam û Kolanên Tebrîzê de şerên pir sext û sengîn hatin bilidarxistin û têde bergirên pir hatin bidanîn. Şahbendera me xwe ji bona guheztina Arşîvê xwe date biamadekirin. Lêbelêjî demeke pir dirêj xwe nedate biajotin, tanî ku Eşîrên Mako ji bona rizgarkirina Urmîyê hatin birêkevtin.

Weha li ser sînorên me de Leşkerekî taybetî ji Xelkên Nexçuwan di bin Rêberîya Serleşker Xazov de ji bona çavdêrîyê hate birêxistin.

Faris bi libexwedaneke pir tund ve û bi taybetî ve li dorhêla Meraxe de pê hatin birabûn. weha wan di dawîya dawî de li ser kurdan de bi kişandina xwe ber bi paş ve dane bineçarkirin.

Weha di pêşîya pêşî de rût û talankirin ji rûçikên Tevgerê bûn. Min bi xwe ve ev tev bihîstin. Weha Kurdan xwe ji bona cihên xwe dane bivekişandin û hêzeke wanî têrkirî ji bona wan nema dihate bidîtin, da ku ew bi Tevgereke din rabin.

Weha G. Arakliyan, yê ku ew di wê pêlê de ji bona Ezerbêcanê nala Namenivîsê taybetî ji bona Rojnama "Deng" hatibû birêkirin. Wî di dawî de date binivîsandin²⁶: Ermenî ji bal Tevgera Ubey-Dula ziyar bi wan ve nehate bikeytin, lêbelê jimareke pir ji Farisan hatin bikuştin û ziyana wan di mal de pirî gewre bû. Serdarîya Farisî bi tundî ve date bipirotestokirin. Şêx Ubey-Dula bi xwe ve ji bona Istenbolê hate birêkirin, lêbelê wî xwe di rêya Qefqasya de ji bona Ezerbêcanê xwe date bivedizandin, lêbelêji careke din jî ew hate bigirtin û ew ji bona Mekê dane bisorgonkirin. Lêbelê Lawê wî Şêx Abdul-Qadir piştî şûreşê li Turkiyê de hate bivegerandin û ew niha Endamê Civata Pîremerdên Turkî ye²⁷.

Di Notan de ji vî Sedsalê çûyî de Turkan dixwestin, ku ew Kurdan ji bona bêbextîyê ligel Dirawseyên xweyî Ermenî de bînin bikaranîn, lêbelê rawestandina pirî bilind ji bal Şêx Ubey-Dula de dê her û her rûpelekî gewrî pirî sipî di mêjûwê de bide bihiştin.

²⁶Nûçeyên Beşê Qefqasîyî Civata Giyografîyî Imperetoriya Rusî, Jimar 4, 17, 19, "Kurd li Farisê de", "bi Zimanê Rusî ve". Gotar bi xwe nala têbînîyên sawilke tete bidîtin.

²⁷Weha pir aghdaryên mêjûyîyî dewlemend li ser mêjûwa Kurdayî nuh de ji bal Nivîsyanên Efserên Rusî de hatine bicivandin: Kartisov, Avryanov, Kamasarov. Ji van aghdaryên hanê hatîye biwergirtin û ji wan jî sûd hatîye biwergirtin. Herwehaji ji Nivîsta Zerî Ingilîzî "Aghdaryên taybetî" li ser hêrişê Kurdan de beramber bi Îran û Turkî jî ve di sala 1881 de jimara 5 " bi zimanê Ingilîzî ve" sûd hatîye biwergirtin.

Hinekan ji Hevalbendên Şêx li ser wî de pêrabûna bi serbirîna Filan ve datin bipêşkeşkirin.

Weha Şêx date bigotin: "Ji bona me Kurdan niha pêwistîya Turkan bi me ve ji bona nabûdkirina Filan têtê bidîtin, weha ger em Filan bidin biqirkirin, dê Turk me jî bidin biqirkirin".

Serleşkerê Giştî Şakir Paşayê bi nav û deng ve xwest, ku ew bi Rastkirinan di sala 1891 de di Wilayetên Enedolê de pê rabe û herwehaji Sipahê bi rêxistî ve ji Kurdan nala Kozakan bide bipêkanîn. Wî ji vî karê hanê mebestdikir, ku ew Kurdan fêrî Rêstik û Tektîka cengê bide bikirin.

Weha bi rastî ve di sala 1892 de "Dibustanên Êldariyê" li Istenbolê û li Bexdadê de hatin bidamezîrandin, da ku Canê Turkî di nava cerk û hinavên Zarokên Eşîrên Erebi û Kurdan de ji Koçeran bête bibelavkirin û da ku ew ji bona Turkiyê bêtin binêzikkirin. Tevî ku ev Dibustanên hanê jî hatin bipêkhatin, lêbelêji ew nehatin bidirêjkin. Weha bi cihanîna van Rastkirinên hanê ve ji bona Zekî Paşa hatin bipêşipartin, yê ku ew ji bal Şakir Paşa ji bona wî hatin bipêşneyarkirin. Weha wî ew wergirtin; jiber wî dixwest, ku ew wan ji bona kar û barên cengê bîne bikaranîn. wehaji pêrejî wî dida bibawerkirin, ku ew dê bikaribe di demeke kurt de û bi malekî kêr jî Hêzeke Çekdar bîne bipêkanîn. Wehaji bi rastî jî ve ev Sazmendîya cengê jî hate bidurûstkirin, ya ku ew di pişt re jî bi "Hemêdî" ve hate binavkirin. Hiç gûman têde niye, ku ev ji aliyê cengê de hate biserkevtin, jibervêji Turkan ji bona veguhertina wêna ji bona Sipahê rêxistî ji Siwaran "Xefîf Suwarî"²⁸ dane biryarkirin.

Weha Sultan Ebdu-Hemîd dixwest, ku ew Kurdan û herwehaji Elbanîyan ji bona mebestên xweyî taybetî bîne bikaranîn. Wîna li wan de dida bitemaşekirin, ku ew serên xwe ji bona yasayên bajartîyê nadin bitewandin.

²⁸Pir kanîyên cengîni li ser "Hemêdî" de têtin bidîtin. Ji bona nimûne ji xwe re li F. F. Giryaznov Kurd û Suwarên Kurdan de bide bitemaşekirin. Nûçeyên Baregehê Serkirdayetîya cengê li Qefqasya de, çîrya pêşîn, 1907, R. 20) bi "Zimanê Rusî" ve.

Wehaji ger çibeji rewşa kurdan ji pîsbûnekê ber ya din ve pişti Dazanîna Destûrê dihate biçûyîn.

Weha bi nav û deng ve tête bidîtin, ku Tevera Turkîya Genc bi lez û bez ve wê xwe ji bona Şovîniya Turkîyî Kotî xwe date biveguhertin. Wê dixwest, ku ew bi darê zorê ve Siyaseta turkirinê di bin durujmê pêkanîna "Welatekî Osmanîyî" Giştî de bide bicihanîn.

Weha vê Tevera hanê dixwest, ku ew Desthilatîya Merivanîyê di navbera Serdaran de ji hev bide belavkirin û bilawazkirin, ji yên ku wan Desthilatî bi Dûndebûnê ve ji xwe re didan biwergirtin.

Weha di encam de tiştêkî pir sersûrayî hate biderketin; jiber ku kar û bar ji bal Karmendên Encûmenan de hatin bidestxistin, ji yên ku wan ne ziman, ne jî reweşt û rabûn û rûniştinên Cihî dizanîn û hêjbêtir ew di Serdarîkirinê de nekarnas bûn, lêbelê jî ew di pêrabûna govend û ahenga de di cejnên Milî de, di peyvdanên zengilî de, di girtina civînan de li ser piştê Keştî û Gemîyan de û di ..hd... pirî şût û konbûn. Ev tevde bi hev re ji Kurdan re bédilê wan bûn.

Hîç gûman têde niye, ku ev gotara hanê li ser mêjûwa Kurdan de dê neyête bitêrkirin, ger ku em li ser Navên wan Kesan de nedin bipeyîvandîn, yên ku bi wan Zanevanên Kurd ve her û her serbilindîya xwe didin bidiyarkirin.

Selah-Edîn yekemîn Kurd bû, yê ku ew di tevaya Dunyayê de bi nav û deng bû. Ew pêkanînvane Binemala Eyûbî bû, ya ku wê serdarîkirin li Misrê de, li Surî de û li Welatê di navbera herdu Çeman de ji sala 1169 Z. de tanî dawîya Sedsalê Sêzdehan de dida bikirin.

Wî zora Qeralê Filan li Qudsê de bir û herwehaji ew Hemberê Berberê bi serketî ve beramber bi Rîşardê Yekemî Ingilîzî û Filîpê Awgostê Firensî bû.

Malbata Zendî date biserdarkirin, ya ku ew ji bal Kerîm Xanê Zendî de li Welatê Farisan de ji sala 1750 de tanî 1779 hate

bidamizirandin. Weha Serdarîkirina wîna bi canekî Mirovanîyî pîrî bilind dihate bipesendarîkirin. Weha tête bizanîn. ku wan herdu Mirovên guddar li derveyî Welatê xwe de Serdarî didan bikirin²⁹.

Lêbelê Malbatên Serbixwe di nava Welatê Kurdistan de Merov dikare Merwanîyan (ji 990 tanî 1096 de) bide bibîrxistin, yên ku em li ser wan de hatin bipeyivandin. Herwehaji li ser Hesnewîyan ji de di Beşê Jêrî-Rojhilatî de ji Kurdistanê (ji 959 tanî 1015 de) Merov dikare bide biaxivtin.

Lêbelê derbarê Mîrên Serbixwe weha Mîrşîniyên: Erdelanê, Sulêmanîyê, Badînan, Rewanduz, Hekarê, Şemdînan, Botan, Beyazîdê³⁰... hd.. dihatin bidîtin.

Herwehaji beşekî ji wan ji tanî vê roja meyî nihajî date bidirêjkirin. Herwehaji pir Serdarên Eşîrên nihajî ew bi xwe ji ve xwedanên wan desthilatîyanin, yên ku pê Mîrşîniyên bi navkirî ve xwedanbûn, bi gotineke din ve ew ji bi xwe ji ve serbixwebûn.

Weha di beşê Jêrî de ji Diyarbekr (di Şarwêranê de) di destpêkirina serdema me de vî Serkê Eşîra Milî Ibrahîm Paşa bi desthilatîya Mîrekî Turkî ve dihate bidesthilatîkirin. Weha wîna ji bona xwe ji hinek ji Eşîrên Erebi ji dane bijêrdestkirin. Wî Bêş û Bac ne didan û ew bi xwe ve li ser rewşê de zal bû³¹.

²⁹Divê em di vî warî de Kurdên Şedadî -sedsalê deh û duwanzdeh- bidin bibîrxistin, ji yên ku wan Serdarî li ser Perçeyên Jêrî de li pişt Qefqasya de dane bikirin. Wan Mizgeft dane biavakirin. Mar, Bergên 132. Herweha li Pol de, Malbatên Musulmanîyê û li Bartold de, R. 295, bidebi temaşekirin.

³⁰Gava me Bayazîd ji xwe re datebi girtin, me Behlûl Paşa date bigirtin. Ew bi xwe ve Mîrê Kurdîyî dawî bû. Me ew ligel xwe de ji bona Tevlîsê date biannî, lêbelê ew ji xwe re revya û Desthilatîya wî li Turkîyê de careke din jêre hate bivegerandin. Lêbelê me ew careke din di sala 1855 de ji xwe re date bidîlkin.

³¹Ibrahîm Paşa bi tevgera xweyî çekdarî ve biştî Dazanîna Destûrê di sala 1908 de pê hate birabûn, lêbelê ew pê nehate biserkevtin; jiber vê ji ew ji bona çiyayê Evdul Ezîzê hate birevandin û ew li wê derê ji de hate bikûştin. "Gordilêviskî".

-Di Avdara sala 1954 de ez bi serdanî ve ji bon ser Goristana vî Ciwanmêrî çûm. Min di Zarotîya xwe de pir li ser wî de ji Mirovên Beşdarkirî xweser di Tevgera wî de dabû bibihîstin.

Weha evaya kurtîyeke raxistî ji bona mêjûwa Kurd û Kurdistanê bû, lêbelê hoyê giştî ji bona nebûna yekîtîyê di navbera wan de û cudabûna di nava wan de ew bi xwe ve di zîneta Ciyografi de tête bidîtin; jiber hebûna dolên pir, rêzên çiyayên sext, rûbarên avêyî xurt vanan bi hev re perçekirina Jiyana Siyasî û Rewşa Derebegîyê dane bikin.

Lêbelêjî tevlivêjî Hestkirina bi Azadiyê û Serxwebûnê jî pir li nik wan de bi xurtî ve tête bidîtin û ev bi xwe jî ve ji pêkanînen hebûna kurd têtin biderketin û ev jî bi xwe jî ve di mêjûwa Tevgera Kurdan jî de têtin biwênêkin.

Herwehaji divê em kêra kurdîyî giştî li ser Ferhenga Kevnar de, di cihên ku ew têde dijîn, nedin bijibîrkin.

Gotara Mar, ya ku me pê date binîşandan, nav û nîşaneke pir ciwan "li ser Pirsîyarîya Têgihiştina Ferhenga Miletê Kurd de di Rojhilata Navîn de" dide bihilgirtin. Hiç gûman têde nîye, ku hin ji remanên Oldarîyê, ji yên ku ew li ser Civaka Kurd de zalin, wehaji wan xwe ji bona nava Rêçikên Filetîyê û Musulmantîyê dane biavêtin³².

Zimanê kurdî ji bona Miletên dorhêlê pir dida bikêrkin û hêj ew pir dide bikêrkin.

Herwehaji li ber Kêlên wî de bi dûr û dirêjî ve di wê serdana hanê de Seydayê Abdul-Qedus Kurê Cemilê Seyda Mêjûwa tevgera wîyî xwînavî beramberî Dewleta Osmanî de ji me re bi ta û derzî ve date bivekin.

Weha bû, Cara Pêşî bû, bi givaştî û hêjibêtir bi gihaştî ve Rûpelek ji Mêjûwa me di nava serên min de hate bimeyandin û di nava nivên Malikên Mejîyê min de hatebi hîlanîn.

Têgihiştin û Liberketina mêjûwa me ji bona min pir Pirsên giran û kûr datin bikin, ku wan tevaya Jîna min bi Lêgerandin û Bersivkrina Zanistîyî wan ve date bitengalkirin. Cuma-

³²Bawerî ku canê mirî bi carekê ve hîç ew ne tête birabûn û ne jî careke din tête bivejandin, mîna ku ew hebû. Farin, mîna ku ew li ser Yezîdîyan de tête biavixvîtin.

Wehajî em li hin Hêlên Wilayeta Bedlîsê de dibînin, ku Ermenîyan Zimanê xwe dane bijîbîrkirin û ew bes û bi tenha ve bi kurdî ve didin biaxivtin³³. Herwehajî li nik Aşûrîyên çiyayî de "reweşteke giştîye, ku ew meqaman bi kurdî ve distrên û çîrokên Gelêrîyî Kurdî dibêjin"³⁴.

³³Weha Mayîviskî, Bêlek û yên din dibêjin.

³⁴Lalayan, Aşûrî di Wilayeta Wanê de, Tomarkirinên Beşê Qefqasî ji Civata Ciyografiya Imperetora Rusî, Jimar 28, Belavûka Çarem, sala 1914 de.

Derîyê Siyem

Jîyana Rojane -Desteyên Çivakî- Kesitîya Kurdan

Ji tevan re diyare, ku Kurd ji bona Êlên Koçer û yên Neşînvani têtin bibeskirin û ew ligel hev de û di nava hev de dijîn. Weha Êlên Koçer bi pîrbûn ve li Jor de di nava herdu Çeman de dijîn³⁵.

Pir wekhevbûnek di şeweyî jîyana wan de û Jîna Qereçiyên, yên ku ew di nava Welatê me de dijîn, tete bidîtin. Weha divê guh pê bête bidan, ku jimareke gewre ji van Êlên hanê xwe ji bona jîyana Nîvneşînvaniyê dane biveguhertin. Di Zivistanê de ew li Dolan de di Xaniyên ji qur û kelpîçan de rûdinên. Di Buharê de ew li nava werzân de dijîn û ew Hinekan ji Neferên Eşîrên xwe nala Pasevanan ji bona xwe didin bikaranîn, herwehaji ew ligel keriyên xwe de bi serên çivan ve têtin bihilkişandin û ew di nava Konan de (ew li dorchêla Sulêmaniyê de bi " Hewar" tete binavkirin) û pîrî caran jî li Zozanan de dimînin.

Ermeniyên, ku ew li Mûşê de ji kevnar de dihatin birûniştin, saw bi rengêkî taybetî ve ji cihên nêzîkî warên Koçeran bi ser wan ve dihate bikevtin. Lêbelê di Serdama niha de evaya bi xwe ve serberjêrî hevdû bûye, weke ku pê Karşinasê Hozan di kar û barê

³⁵Di derbarê Serjimara Kurdan de, Êlên wan û Malên wan de agehdarîyên pir bi nexr ve têtin bidîtin: Ji xwe re li gotara Saykis de bide bitemaşekirin. Herwehaji nûçeyên Mecer Tirotîr jî di vî babetê hanê jî de têtin bidîtin, li Wergerandina "Kurdên Asya Biçûk, Nûçeyên Beşê Qefqasî Civata Ciyografiya Imperatoriya Rusî Bergê 7, sala 1882, R. 1-14"; herwehaji li karê pir mezin de ji xwe re lê bide bitemaşekirin, ji yê ku ew ji bal Lêrç de pê hatîye bikirin "Lêkolînên li ser Kurdên Îranî de û pêwendiyên wanî ligel Çaldêrên Jorî de, Pêtersburg, 1850, Bergê Yekem, R. 1-63". Lêbelêji tevî giringbûna vê Çaviya hanê jî agehdarîyên tede hatine bikevinkirin.

Erministanê de Lênc tête bimukurhatin, ew dibêje: "Êlên Koçerên Kurdan li ser rêzên çiyayên Erministanê de xwedan gundên xweyî taybetî têtin bidîtin"³⁶.

Ev Êlên mezin di nava van Hêlan de ew bi xwe jî ve wan rabûn û rûniştinên hanêyî giştî ji yên Êlên dûr nala Eşîra Caf li Şehrezorê de (Koka vê Eşîra hanê ji Îranê tête bidîtin) didin biparastin.

Di rêketina Êlan de rûçikên pîrî sersuranê têtin bidîtin. ew bi roj bi ser rê ve dikevin û bi şevê ve li qonaxên nîşankirî de didin bixewkirin û ew Peyên xwe li ser qafên çiyayê de didin bihiştin.

Wêha jimarek ji Eşîrên Kurdan li hinek cihan de ji bona "dijî Milîya kurdî", ger ku Merov bikaribe bide bigotin, hatine biveguhertin. Ev xuyanîya hanê jî pîrî caran jî Merov wê li cihên dûrketî de yanî ji yên li ser sinorê Milîyî Miletê Kurd de dide bidîtin.

Lêbelê derbarê Zînetê Cîvakî de Kurd bi rengê giştî ve ji bona Êlan têtin bibeşkirin. Eşîr ji Du Çîniyan tête bipêkhatin:

Yekem ji Şervanan, ew bi xwe Serokin (Axa), Xwedîyên erdan û Peyên xwe,

Duwm ji Cotkaran (Goran)³⁷, yên ku ew nala Nîvbendên erdê lêbelê bi rengê nermtir têtin bidîtin.

Hestkirina pêwendîyên Malbatîyê, nemaze pêwendîya ligel Axê de ew bi xwe ve hestkirineke pîr bi serbilindî ve bi Merivanîyê ve tête bidîtin, tanî ku ew bi pileyekî bilind ve hatîye

³⁶H. F. B. Lenc, Erministan - Çûn, Hatîn û Xwendekarîkirin, sala 1901, Perçê Duwm, R. 423 "bi Zimanê Ingilîzî ve". Herwehaji wergerandîneke Rusî jî tête bipêydakirin, ya ku Conkoviskî di sala 1910 de pê hatîye birabûn.

³⁷Evên dawî pîr caran bi "Goran" têtin binavkirin. Wêha li ser vî bingeşê hanê de ji bona vê gotinê du liberketin têtin bidîtin. Ya Pêşî bi têgihîştina Cotkar yanî Werzeşvan ve tête biliberketin û ya duwm bi xwe ve ew bi navê Eşîrekê ve tête bidîtin, ya ku ew li beşê Rojhilati Zehaw de tête bijiyandin. Rawilson dide bibawerkerin, ku koka Eşîra Goran ji Eşîra Kulhor tête biderketin. Wêha Sultan Muradê Çarem Bacolî ji Diyarbekrê dane bianîn, ku wan Kulhorî di nêzîka sala 1639 Z. ji Rojavayî Zehaw dane biderkerin. Cudabûnê heyî di navbera Zaravayê Goranî de - li yê tê binê û Kulhorî de vê bawerîya hanê didin binayînkirin.

bigihaştin, ku ew hestkirina hanê bi xwe ve nala beşekî ji Hebûna wan têtê bidîtin³⁸.

Li pir cîyan de li Axê de bi çavekî pirî bilindî ve bi serkevî ve lê têtê bimeyzekekirin û li Xelkên din de bi çavekî din ve li wan de têtê bitemaşekirin, ku tê bêje, ew ji Tuxmekî din têtin bidîtin.

Bi rastî jî ve divê bête bigotin, ku di Kesîtiya Axê jî de rûmet û comerdî tanî pileyekî pirî bilind têtê têtê bidîtin, ku Merov jî awira pêşî de dikare wî ji cotkaran bide bicudakirin. Di Kesîtiya Axê de karîneke pirî berz û bala ji bona zalbûnê têtê bidîtin.

Wehaji ji bona bicîhkirina rastîya vê Dîtinê hanêjî ji aliyê mējûyî jî de divê em bêjin, Ku Bav û kalên Eşîra Şikakan jî dikaribûn Xelkên Kevnar bidin binabûdkirin, ji yên ku ew li heremên nala Kotur, Soma û yên din dîjyan.

Bi rengê giştî ve Kesîtiya kurd tanî radeyekî têtê bicudakirin, ku bi me ve pir dijar têtê bidîtin, ku em bikaribin piştî xwe bi rûçikên Intropoloci³⁹ ve bidin bigirêdan. Jîbervêjî Merov dikare li nik Kurdan de rûwê guroverî Ermenî û yê Samîyî Erbî, yanjî bi bêtirbûn jî ve yê Aşûriyî File bide bidîtin.

Lêbelê Kurdên li herema Sulêmanîyê de bi renekî giştî ve li ser Kesîtiya xweyî Îranîyî qenc de dane biparastin; jîber ku ew dûrî Miletên din dihatin bijîyandin.

Weha Nivîsyanê Ermenî Abovyan bi vî rengî ve Kesîtiya Kurdî dide bipesinandin:

"Merov dikare Merevê Kurd jî awira pêşî bi mêranîya wî ve û bi bejna wîyî bilindî bi tirs ve bide binaskirin, ya ku ew bi xwe jî ve di wê demê bi xwe jî de bi tirsê ve qerfê xwe dide biderxistin. Bi servêdeji ve rûwê Merovê Kurd jî bi çavên mezinî agirî ve, bi

³⁸Turkan xwestin, ku ew di dema vegirtina xwe de ji bona heremên ser sînorê Farisî bi Rastkirinan ve di nava Cotkaran de pê bêtin birabûn. Min bi guhê xwe ve ji Cotkaran pir caran dayite bibihîstin, ku wan bi dilekî pirî şikestî ve didatin bigotin "Ji îro û pêve Axê jî bona me neman"; jîber ku Turkan xwestin, ku ew Desthilatîya Axan bidin binabûdkirin.

³⁹Agehdaariyên pirî kêr li ser Itnografiya û Intropolociya Kurdan de têtin bidîtin.

-li rûnkirinên A. A. Î vanoviskî de, Yezîdî, Kovara Intropolociya Rusî, sala 1900, Jimara Siyem) bi "Zimanê Rusî" ve bide bitemaşekirin.

biruwên pir bi tov ve, bi anîyeke bilind ve, bi pozxwarîyeke dirêj ve, bi xêz û dêrên pirî xurt ve, yanî bi gotineke din ve bi hemû rûçikên Pehlewanên Kevnar tve ête binîşankirin".

Weha divê lê bête binîşandan, ku Kurdên, yên ku ew li perçên Rojavayî ji Îranê û Lor de dijîn, ew bi xwe ve ji Êlên Koçer ji Miletên Hindû-Ewropî tanî niha bi tenha xwe ve ew mane.

Institut kurde de Paris

Derîyê Çarem

Ziman - Wêje - Nivîsandin

Zimanê Kurdî ji Malbata Zimanên Îranî ye, weke ku ew tête binaskirin, ji Zimanê Farisî, Afxanî, Biloci, Astînî û ji hin Zaravayên kevin û nuhî din tête bipêkhatin.

Zimanê Kurdî ew bi xwe ve ne Farisîyeke veguhertî ye, lêbelê ew bi xwe ve bi serêxwe ye, jêre qanûnên wîyî fonîtîkî û sintiksîsîyî taybetî têtin bidîtin. Pêwendîya wî ligel Zimanê Farisî de wek pêwendîya Surbî ligel Rusî de, yanî hêjî hûrtir mîna pêwendîya Zimanê Adîyî Siwêsrîyên Çiyayî ligel Italî de tête bidîtin.

Bi diyarî tête bidîtin, ku Bavpîrê Farisî ew bi xwe ve Farisîya Naverast (pehlevî) bi xwe ye. Zimanê Farisîyî kevin ew bi xwe ve zimanê nivîsandinê mêjûyî bi xwe ye.

Lêbelê Zimanê Kurdî ew bi xwe ve ne bi vî jî û ne bi wî jî ve pêwendîyekê dide bilidarxistin. Herwehaji bi xwe jî ve ew pêwendîyeke xweser bi Zimanê Îranîyî kevnî Duwem (yê Avîsta) jî ne nade bidîtin, yê ku Nivîsta perest (Avîsta), Nivîsta Ateşperestan pê hatiye binivîsandin⁴⁰.

⁴⁰Divê ji nuh ve lênerîn li pir van bîr û bawerîyên hanê de di vî babetî de bête bikirin, nemaze piştî dozandinê nivîsandina bi Farisîya Navînî ve li Turkîstana Çînî de hatine bidîtin. Weha di nava wan nivîsandinan de hatiye biderketin, ku di Farisîya Navînî jî de Zarav ji têtin bidîtin, ku ew ji hevdu bi diyarî ve têtin bicudakirin. Kar û barên Oskarman pir tiştan di Zimanên Îrana Rojava de didin bidiyarkirin.

Weha bawerîyek tête bidîtin, ku Zimanê kurdî mîna piranîya Zaravayên nuh li Îranê de pir ji perçeyên pêkananîna xwe ji zimanê Mêdiyî windabûyî dayite bisitendin. Mîdya bi xwe ve ew patîşahî ye, ya ku wê li Îrana kevnar de serdarîdikir.

Zinamê Kurdî ji bona pir Zaravan tête biparvekirin:

1. Zaravayê Jêrî: ew bi xwe ve ji Zaravayên Kermensah, Senendec ... hd. tête bipêkhatin.
2. Zaravayê Rojhilat: ew bi xwe ve ji Zimanê Sulêmanîyê û Sawçexlax tête bipêkhatin.
3. Zaravayê Rojava: ew bi xwe ve bigir li tevaya Hêlên Kurdistanê de tête bibelavkirin.

Weha Kurdên Rojhilat û herwehaji Kurdên Rojavayî ji Zimanê xwe bi "Kurmançî" ve didin binavkirin, tevî ku Kêmanî jî bi Zaravayê Rojhilat jî diaxivin, lêbelêji wê paqijîya xwe li ser peyvkirina xwe de dayite biparastin⁴¹. Ji nîşanên cudabûna di navbera herdu Zaravayên Rojhilat û Rojava de tête bidîtin, ew Bernavê Tekî Peyvdar bi xwe ye. Weha di Zaravayê Rojhilat de "Men nazanim" ew di Zaravayê Rojava de bi "Ez nizamim" tête biveguhertin. Ev herdu tégihîştên hanê jî bi xwe jî ve ew bi diyari jî ve ligel Silavî de têtin bimînahevkin; jiber ku ew hemû ji kokeke yekbûyî têtin biderketin.

Wêjeya Gelêrî li nik Kurdan de pir bi dewlemendî tête bidîtin û di nava wê de çîrokên pir bê jimar li ser rabûn û rûniştinên Milî de tède têtin bipeyda kirin. Tède Sitran û Goranî û bi taybetî ve sitirana liberxwedana Keleha Dumdum (ya ku ew li Jêrî Gola Urmîyê de û li nêzikî Çemê Rewandûzê de tête bikevtin), ya ku ew ji bal Şah Abasê Farisî de hate liserhêrîşkirin, tête bidîtin. Bi vê sitirana hanê ve Kurd bi evîndarî û serbilindayî ve pê didin bisitirandin. Herwehaji pêrejî ew bi xwe ve di nava xwe de rûdanên pir bi rastî jî ve dide biderxistin. Herwehaji li nik Kurdan jî de Destana Milîyî Taybetî bi wan jî ve "Mem û Zîn" jî tête bidîtin. Ew bi xweşxuwani û bi çîrokî jî ve li tevaya kurdistanê de

⁴¹Merov di kare Zaravayê Mukrî (Sawçexlax) de mîna Zaravayê kilasîkî ji bona Zimanê kurdî bide bidanîn. Ev Zaravayê hanê bi dîr û dirêjî ve ji bal Oskarman hate bixwendekarîkirin.

pê têtê bisitirandin: Mem û Zîn Du Evîndar bûn, lêbelê jî Mem ne di rêza endaziya Dildara xwe de ji bal zîneta Civakî de dihate biderketin. Weha Mîrê Botan li ser evîndariya Memê de hate biagehdarkirin, yê ku ew bi xwe ve Birayê Zînê bû. Bi vê ve ew li ser Memê de hate bitûrekirin û jibervêjî wî ew date bizindankirin.

Lêbelê jiber tîrsa Serhildana Gelêrî Mîr xwest Mem bide biberdan û li ser mêrkirina wan ligel hev de ew pêhate birûniştin.

Lêbelê Mem di nava evîndariya xwe de hate bimirin û li ser vê jî de bi xwe jî ve Zîn jî hate bimirin.

Weha ew herdu li kêleka hevdû de hatin biveşartin. Pir gul di navbera herdu Gorên wan de nala nîşana vê evînê, ya ku ew ji mirênê xurttir têtê bidîtin, hatin bişînkirin⁴².

Hunera Xweşxuanîyê li nik Kurdan de pir bi firehî ve têtê bidittin. Rewşene, ku em nikarin berkin Xweşxuanvanên wan baştir jiberkinin xweşxuanvanên Muslmantiyê bidin biderxistin, lêbelêjî di hemîn kat jî de li ser me de divê, ku em bidin bi bîrxistin, ku qelsbûna di xwendekariya Zimanî de bi gihandina vê baweriya hanê date bikêrkirin.

Heşt navên ji Xweşxuanvanên Kurdên kevnar bi nav û deng û nasin⁴³. Kevintirîn Kes jî wan bi xwe ve ew Melê Cezîrî ye, yê ku ew di Sedsalê yanzdehên Zayînê de hatiye bijîyandin. Weha li ser şeweyê Lêtografi berkinirên wîna ji bal Hartman li Elemanya de der sala 1904 de hatine bibelavkirin. Weha Rojhilatnasîyê karşinasîyeke wisa nikaribû bida bipeydakirin, ku wê dê bikarîba vê Dîwana hanê bide biwergerandin.

Di derbarê serdema nuh de ez didim bibawerkirin, ku Navînîya Bingehî ji bona xweşxuanvanên Kurdan ji bona bajarê Sulêmanîyê hatiye biveguhestin. Weha li wê derê de Xweşxuanvanê pir bi nav û deng Nalî hatiye bijîyandin.

⁴²Metnê nivîsandina Japa bi Metnê nivîsandina Destana Ahemedî xanî hatiye bipêkêrkirin. Lêbelê metnê din, yê ku ew ji bal Oskarman de li Merîwanê de hatiye bitomarkirin, rûdanên wî pir ji dema me nêzîktir têtê bidîtin. Herwehaji ew ji tevaya metnên din jî bêtir rastîyê dide biderxistin.

⁴³Li Japa, Rûnkirin, Pêtersburg, sala 1860 de, R. 7-11 bi "Zimanê Firensî" ve lêbide bitemaşekirin.

Weha ji bona nimûne li ser Xweşxuanên kurdî de em van herdu nivîsandinên tên didin bipêşkeşkirin:

- 1 -

Zulfet le qedit dake perîşan û belawe Em ro le minî şifte
aloze û belawe
Bo çi negirîm sed keretîm dil şikînî Mey bo çi nerjî şûşe li
sed lawe şikawe

- 2 -

Her çende ke rûtim be xweda mayîlî rûtim. Bê berkîyî ilet ke
Hetî û meylî hetawe

Her wehajî vaye çend let ji sitirana Gelêrîyî Kurd didim
bipêşkeşkirin.

- 1 -

Hey lê lê Eysanê, çîya pirî bilindin, ez nikarim te bibînim.
Min çend dixwest, ku ez destên xwe di nava destên te de bidim
bixistin, bibadan, bipêçan û bigivaştin.

Li vê derê de, li vê Holê de, li vê dêrê de, li vê hêlê de, li vê
dunyayê de kesek nala te, dîdara te, mîna te nayête bidîtin.

Ezê dê tenbûrekê, sazekê ji çardeh têlan bidim bisazkirin,
çîekirin, da ku ez derd û kulên xwe, jana nava dil û hinavên xwe
di nava wan tilan de ji te re bidim bilêdan û biderxistin.

Ezê dê tenbûrekê, sazekê ji hesîfîyên çûkan bidim bisazkirin û
dê ezê têlên wan ji biskên Bûkan bidim biçêkirin.

Hey lê lê Eysanê tu Patîşaha mine, na hêjbêtir tu dilê min bi
xwe ye.

Tu niha gula bişgîvandina buhara jîna mine.

Bavê teyî bêbav bi awirên xweyî tûj ve di bin çavan re li min û te de dida bitemaşekirin.

Wê gava, hingava ku ew min ji bona nava gorê bidin biavêtin, debera Eyşana min, şêrina berdilê min li ber kêla serê min de bête birawestandin û ji min bide bipirskirin:

ma çi bi te hat! ma çi derd û kulên te bûn! tu ronahîya herdu çavên min bi xwe bû, tu şêrinê ber dilê min bû⁴⁴.

(Ev sitirana hanê ji Kurdî ji bona Rusî û ew ji Rusî ji bona Erebi hatîye biwergerandin û min jî ew jî ji Erebi careke din jî bi şeweyekî firehtir ve li gora zanebûna xwe ji bona Kurdî dayite bivergerandin. Ez pir hêviya lêbuhurandinê dikim, jiber ku ew ne koka xwe ye. Cuma).

Debera Rexnevanên dilhişk gotina Poşkîn li ser sitiranên Qefqasî de careke din jî ji xwe re bidin bivegerandin, debera ew careke din jî bi nebaşî jî ve li ser sitiranên Kurd jî de bidin bidêrandin "ku ew Rojhilafîne, bê nask û kelkin, lêbelê jî ew jî hêjî bi hin hêjabûnên Xweşxuwani jî ve têtin bimalkirin". Bi servêdeji ve, Tevlivîjî bi diyarî jî ve Wêjeya Kurdîyî Gelêrî bi hîç rengekî ve ew ne nala wan cûtandin û kalandinên hîç û pûc jî têtê bidîtin, jê yên ku ew di vê dawîya hanê de li ser rûpelên hin ji Rojnameyan de di bin navê "Surûdê Kurdî" de hatine biderketin.

Livêderêjî divê bête bigotin, ku Zaravayê Goranî⁴⁵ roleke pirî giring li Kurdistana Jêrî de dide bilîstin. Ew bi xwe ve bi ser Zimanê Farisî ve têtê bikevtin. Weha ji bona vî Zaravayê hanê şopên wîyî Kilasîkî jêre têtin bidîtin, herwehaji têtê bibawerkirin, ku ew ne ji Zaravayên kurdî jî têtê bijimartin.

⁴⁴Ji tomarkirinên Oskar Man, Zaravayê Mukrî, reng û naveroka vê sitirana hanê, ya ku ew li ser sê malikan têtê biavakirin, ew me bi meqamên gelêriyî Sipanî ve tîne bibîrxistin.

⁴⁵Weha li ser me de divê, ku em bidin bibîrxistin, ku li teniştê Zaravayên Kurdîyî Taybetî de hêjî du Zaravayên din jî Zaza û Goranî jî têtin bidîtin. Yên ku ew bi van zaravayên hanê ve didin bipeyivandin, bi xwe jî ve bi Kurdî jî didin biaxivtin.

Bi vî Zaravayê hanê ve Evsanên Rojhilatîyî bi nav û deng ve mîna "Leylê û Mecnûn", "Xusro û Şêrin", "Xurşîdê Xawerî" û yên din pê hatine binivîsandin. Cihangerê Ingilîzî Rêç di destpêkirina Sedsalê çuyî de Destnivîsandinên van Evsanên hanê ligel xwe de ew anîn⁴⁶. Ew niha bi xwe ve li Atîkxana Bîrîtanî de têtin bihilanîn.

Herwehaji min jî ji xwe re jî ji herema Zehaw di sala 1914 jî de çend ji Destnivîsandinên nuh ji van Evsanên hanê û hinên din jî dane biwergirtin.

Rojnameya kurdîyî pêşî bi navê "Kurdistan" ve dihate binavkirin. Ew li Qahire de der sala 1898 de hate biderketin. Di pişt re ew ji bona Cinêvê hate biveguhestin. Belavkirvanê wê Ebdul-Rehman Paşa Beg bû, ew yekek ji Zarwên Bedirxan bi xwe bû.

Lêbelê Rojname Duwem ew piştî Şûreşa Turkî hate bidamezirandin. Damezirandinvanê wêna Şêx Ebdul-Qadir bi xwe bû, lêbelê derketina wê bi xwe ve neda bidirêjkin. Di dawî jî de Komek ji Kurdan di nava Desteyên Xwendevan û Rojenamevanan de hatin bidîtin, yên ku wan di sala 1913 de Civata "Hêviya Kurd" datin bipêkanîn û wê dest bi derxistina Kovara xweyî Mehane "Roya Kurd" ve date bikin. Ji bona vê Kovara hanê berê wêyî Milî pir bi diyarî ve dihate biderketin.

Li ser bergên wê Wêneyên Gewreyên Kurdan nala Selah-Edîn û Kerîm Xanê Zendî dihatin bibelavkirin.

Wêna canê şiyarbûna Milî di nava cerg û hinavên Kurdan de dida bidadan. Herwehaji pêrejî wê pirojeyekî nuh ji bona danîna Alfe Baya Kurdî date bidanîn. Weha navê Kovarê bi "Hetava kurd" ve di sala 1914 de hate biveguhertin. Ez bawerdikim, ku ew pir dihate bibelavkirin. Weha min bi guhê xwe jî ve li heremên Sulêmanîyî dûrjî de li ser vê Kovara hanê jî de dayite bihîstin. Weha Gewreyên Cihî û Zanevanan pir bi pirsîyarîya Kurdîyî Milî bi jêhatbûneke jîndarî û careke din ji nû ve guh pê didan bidan.

Weha Mujdevanên Pirotistantî bi alîkarîya Civatên Elemanîyî bi kar ve li Sawçebîlaxê de di pêşîya cengê de bi belavkirina

⁴⁶Berhevokên Rêç, li cihên Destnivîsandinan de, li Antîkxana Bîrîtanî de.

Kovareke biçûk di bin navê "Kurdistan" de pê hatin birabûn⁴⁷. Wê gotar li ser Rêziman û nimûne ji Xweşxuanên Gelêrî de date bibelavkirin, ji yên ku wê ew ji Nivîstokên Oskar Man didatin biwergirtin.

Herwehaji lêgerandin û Xwendekarîyên pir ji li ser Kurdan ji de û nemaze li ser Zimanê wan ji de têtin bidîtin. Tevî ku Rêwîvanên Rusî ji, yên ku ew li nava Kurdistanê de hatine bigerandin, pir ji kêmin ji wan Baron Bodî, Çîrovkov⁴⁸, Xanîkov⁴⁹, V. F. Mayyîvîskî, P. A. Tomîlov, K. Sêmiryov⁵⁰, Maksîmovîç-Vasîlkovîskî û yên din⁵¹.

Tevlivêji em bi serbilindî û payebûn ji ve nikarin bidin bigotin, ku cihê Xwendekarîya Zanistî li ser Kurdan de ew bi xwê ve li Rusya de ye. Weha Akadîmîvanê Palas di sala 1787 de bi danîna "Ferhengeke beramberkirinê ji bona tevaya Ziman û Zaravan" bi

⁴⁷Jimara yekem, ya ku ew di nava destên min de ye, di nîsna sala 1914 de hatiye biderketin.

⁴⁸Rojên Wênerê Rusî der sînorên Turkî-Îranî de di nava salên 1849-1852 de, ew bi serpereştîya Gamazov ve li Pêtersburg de di sala 1875 de hate bibelavkirin. Ev Nivîsta pir bi nêrx ve pir di hemberîya xwe de kême, herwehaji pir bi dujwarî ve ew têtê bidestkevtin. Daner bi serdana pir cihan ve hatiye birabûn, ji yên ku Serheng Çîrîkov pesnê wan daye bidan. Ez bi pêwistî ve dizanim, ku li vê derê de li ser rastî û rawestandina li rastê de ya vî Gervanî bidim bigotin. Em dikarin pê xwe bidin biserbilindkirin. Ev karê hanê hêji bi giringbûna cihê xweyî zanistî ve dide biparastin.

⁴⁹Li çûna wî de ji bona kurdîstana Îranê, Nûçeyên Civata Ciyografiyî Imperetoriya Rusî, sala 1852 de, Beşê Şeşem, Perçê Pêncem, R. 1-18. Weha li tomarkirinên Beşê Qefqasîyî Civata Ciyografiyî Imperetoriya Rusî, sala 1952 de bide bitemaşekirin. Di Nivîsta Yekem de Rûnkirinên Mîr Gagarîn li ser Senendec de têtin bidîtin.

⁵⁰K. N. Simêrnov, Serdanek ji bona Jorî Kurdistan, Nûçeyên Beşê Civata Ciyografiya Imperetoriya Rusî, Bergê 27, Jm 4, sala 1904.

⁵¹Çûnek ji bona Welatê Faris, Nûçeyên Beşê Qefqasîyî Civata Ciyografiya Imperetoriya Rusî, Bergê 27, Jimare. 4, ligel Raportekî de li ser vê Çûna hanê de.

fermanekê ve ji nik Imperetora Katerîna Mezin de hate bifermarkirin.

Weha di cara pêşî de li kêleka Zimanên din de 276 Peyvên kurdî jî hatin çbiapkirin.

Ji bextiyarî jî weke ku pir caran jî di mêjûwa zanistîyê jî de têtê bidîtin, ku ev karê hanê jî ligel karekî din jî de di hemûn kat jî de li hev hate birasthatin.

Hiç gûman tede nayête bidîtin, ku ev herdu rûdanên hanê jî hîç pêwendîyek yanî naskariyek di nava wan de nedihate bidîtin. Ev karê hanê jî bi xwe jî ve Yekemûn Rêzimana Zimanê Kurdî bi xwe bû, yê ku ew bi Zimanê Italî di hemûn sala 1787 de li Roma hate biderketin û Danerê wî bi xwe ve Mujdevanê Katolîkî Mawrîzyo Garzonî bû. Daner bi xwe ve 18 salan berî derketina Nivîstê li Êmadiya dûr de dihate bijîyandin.

Weha em niha dijarîya jînê berî Sed û pêncî salî li nava cergê Kurdistanê de dikarin ji xwe re di nava serên xwe de bidin biwênekirin.

Weha Xebata vî Bavê Garzonî û karên wîyî pir bi nerx û hêja ve Mafe bi me ve pê dide bidan, ku em wî bi nala "Bavê Xwendekariyên Kurdî" ve bidin bidanîn.

Lêbel bê ka çawa Xwendekariyên Kurdî di ayinde de hatin bipêşveketin! Evaya bi tenha xwe ve sûd pê ji bona Karnasan tede têtê dbierketin, lêbelêjî hinek ji rewşên jirêderketî jî têtin bidîtin, ku hîfek ji agehdariyên li ser vî Miletî jî de hatine biderketin, ku ew bi xwe jî ve nala vekirineke Cîhanî jî ji bona Rojhilatnasîyê ve jî hatîye bidîtin.

Ji Sedsalê Hîjdehan de em li ser hebûna Belgeyên gundîyî, yên ku me ew dane bibîrxistin, li ser Eşîrên Kurdî de didin zanîn. Ji wan re giringbûnek ji bona diyarkirina hinek ji aliyên jiyana Mîrneşîniyên Kurdî di hin pêlan de dihatin dîtin, ji yên ku li nik me de di nava wan de agehdariyên pirî kêr û pir tevlihev dihatin dîtin.

Rêwîvanên Ingilîzî bi pir karên giran ji bona wergirtina lîstên navên van Eşîran pê hatin rabûn. Paştirîn Lîstên navên van Eşîrên hanê bi xwe ew Lîstên ku ew bi destên Sipahên Rusî ve hatibûn kevtin.

Weha di sala 1828 de di nava rojên cenga Rusî-Farîsî de Ceneral Soxtilîn bajarê Erdebîlê ji bal Leşkerê wî de hate bigirtin. Ji nava tiştên, ku ew jî hatin bigirtin, wehajî Nivîstxana Sefewîyî bi nav û deng bû.

Ew di pişt re ji bona bajarê Pêterborgê hate biguhestin. Weha Belgeya gundî Şerefname jî bi xwe jî ve ew di nava Nivîstên pîrî Nivîstxanê jî de dihate bidîtin.

Bi rastî ew Destnivîsa hanê Daneyeke pîrî bi nerx û hêja bû. ew bi xwe ve ji bal Daner di sala 1599 Zayîne de hatibû bixwendin û bi (rêk û pêxistin) û wî ew ji bal xwe de û bi mora xwe ve dabû bimorkirin.

Zanistvanên me bi regekî pîrî baş ve giringbûna vê Destnivîsta hanê datin bizanîn. Weha jî bona gava pêşî Akadimîvanê Vîlya Minov-Zîrnov hemû Nivîsînên Farîsî datin bibelavkirin. Wehajî di pişt re jî Akadimîvanê Şarmo Nivîst bi wergerandineke Firensî ve di Çar Perçan de date bibelavkirin. Wî piranîya Temenê xwe ji bona vî karê hanê date bitirxankirin⁵².

Li herema Simolînskî de û di pêla cenga Qerem de hinek ji Dîlên Turkan dihatin bidîtin û di nava wan de Komek jî ji Kurdan dihahte bidîtin. Akadimîya Zanistîyan ji bona nava wan Mîrza Lêrç date birêkirin.

Weha wîna di cara pêşî de hinên ji Metnên Kurdîyî Zanistî date bibelavkirin.

Li ser Kurdan hinên din ji Rusên xwedanên Diploman Bîrfîzîn û Dîtêl datin bigerandin. Weha ew ji bona Rojhilat di salên Çîlî de ji Sedsalê çûyî de hatin birêkevtin.

Herwehajî ji van herdu Rusan bêtir jî Dudwê din jî ji Şahbenderên Rusan A. Xodizko û A. Japa xwe bi vî karê hanê ve dane bimijûlkirin. Yê pêşî bi evîndariya xweyî mezin ve ji bona dozandinê dihate binavkirin. Ew pîr digerîya û pîrî wî jî dida binivîsandin.

⁵²Şarmo di Sîyan de di Destnivîsînê de dest bi kar date bikirin, lêbelê wî bîst salan dest ji kar date biberdan. Wî di sala 1868 de bes û bi tenha ve dikarîbû Bergê Yekem ji Wergerandinê bide bibelavkirin. Lêbelê Bergê Çarem, yanî Nivîsta Duwem di sala 1875 de hate biderketin.

Weha ew li Parîsê de ligel Kurdekî Zanevan de lihevraşt hat. Wî di pişt re bi Zimanê Firensî ve (di Kovara Asya 1857 de) gotarek li ser Zaravayê Sulêmanîyê (Zaravayê Rojhilatî) de date bibelavkirin.

Lêbelê Şahbender A. Japa ew bi xwe jî ve ji sala 1848 tanî 1868 li Erzeromê de dima. Weha wîna Zaravayê Rojavayî ji Zimanê Kurdî ji xwe re dida bixwenidin. Wisa bi vî rengî ve wî Komek ji Zanevanên Kurdan li dorhêla xwe de bi serhev ve datin bikomkirin û wî bi alîkarîya wan komek ji gotaran, Ferhengê Kurdî-Firensî û Nivîstek di pevdarîyê de bi Zimanê Firensî-Kurdî ve, herwehaji di dawîya dawî jî de wî Ferhengê mezîni Firensî-Rusî-Kurdî date bidanîn. Weha Akadîmîya Zanistîyan bes û bi tenha ve bi belavkirina herdu karên pêşî ve pê hate birabûn. Wisa herdu karên din, yên ku ji bona wan giringbûneke waniyî zanistîyî pirî mezin hebû, di ser guhan re hatin biavêtin.

Wetov ev serbilindaya hanê ji bona min bi pişk û par ve hate biderkevtin, gava ku di rêya lihevraştinê de ew herdu karên hanê bi destên min ve hatin bikevtin.

Di sala 1913 de Lidûmayên Mirza japa hemû Destnivîsandinên Kalên xwe ji bona min dane bisipartin. Ezê dê hemû karinên xwe bidim bikarxistin, da ku ez wan bidin biçapkirin.

Weha di dawî de Pirofîsor Yegyzrov li ser Kurdên Rusya de li herema Yêrîvanê de di salên Hevftêyî de ji Sedsalê çûyî de date bilêvenerîn. Ew ji Biçûkanîya xwe bi Zimanê Kurdî dihate biaxivtin; jiber vê jî wî dikarîbû pir tişt bidana bitomarkirin û pir tiştên baş jî wî dikarîbû ew bidana binaskirin⁵³. Weha Xwendekarîyên kurdî li Rusya de li Derve de bi wan ve pê dihatin birûniştin.

jiber vê jî em dibînin, ku karên Zanistvanên Elemanî Yustî, Perîm, Sutsin û herwehaji Metnên nivîsandî ji bal Makasê Nemsawî jî ew ji bona Akadîmîya Zanistî ji bona çapkirina wan hatin bisipartin.

⁵³Tomarkirinên Beşê Qefqasiyî Civata Ciyografiya Imperetoriya Rusî, Nivîsta Sêzdehem, Belavoka Duwem, sala 1891 de.

Weha ev tev karên hanêyî Zanistîyî bi sûd ve li ser kurdan de li nik me de li Pêtersburgê de dihatin bidîtin. Weha divê bête bibîrxistin, ku di nava rojên nêzîkî çûyî de pêrabûneke Elemanîyî xurt ji bona bidestxistina vê Monopolkirina meyî Zanistî di vî warê hanê de daye bikin. Weha Zanistvanê Elemanî Oskar Man bi alîkarîya Imperetor Vilhilm bi xwe ve bi gera Çar salan ve li Faris û Turkîyê de pê hate birabûn. Weha wî li ser kurdan de bi taybetî ve xwendakariya xwe date bikin. Ma gelo ev pêpêkirina giringîyî hanê bi xwe ve ew ne detsdirêjkirineke di nava pirsîyarîya Kurd de bi xwe ye?

Di vî warê hanê de nuhtirîn tişt ew bi xwe ve Rêzimana Zimanê Kurd ji Sonê Inglîzî bi xwe ye, ya ku ew di sala 1913 de hate biderkevtin⁵⁴. Ev Nivîsta hanê bi sûde û Kesîtiya Daner ve bi xwe ve pir ecîbe. Weha wî xwe bi dizî date bîmusulmankirin û ew demeke dirêj li Kurdistanê Jêrî de bi veşartî ve di bin navê Mîrzayê Farisî de hate bijîyandin.

Weha di dema niha de Mîrza Orbîlî li Zanistgeha Pêtrogiradê de xwe ji bona xwendindana Zimanê Kurdî dide bikarxistin. Em jê hêvîdarin, ku ew dê reweştî pêşrewîya Rusî di xwendekariyên Kurdî de bide bijîndarkirin.

⁵⁴Herwehaji nivîsta pir baş Gerandîneke veşartî di nava Welatê di Navbera Herdû Çeman de û Kurdistanê de, london, 1912, "bi Zimanê Inglîzî ve". Li vê derê de divê bête bibîrxistin, ku Son ji Turkan nedida bihezkin, lê wî mêldariya Faris û Kurdan dida bikin.

Derîyê Pêncem

Oldarî

Piranîya pir ji Kurdan Musulmanên Sunînin. Ev xuyanîya hanê di berberîya Turkî û Farisî de li ser Kurdistanê de ew li qazanca Turkan de bû. Weha Turkan evaya di hêrişê xwe de li ser Îranê de di sala 1905-1912 de ji xwe re datin bikaranîn. Wisa Ser leşkerê Turkî Tahir Paşa ji bona tevaya Dunyayê re dîtina xwe date bieskerekirin, ku tevaya Kurdan bi Dewleta Osmanî ve têtin bigirêdan. Lêbelê ji di rastîyê jî de, tev li dîtina li ser dîtina Sûnî de bi xwe jî ve, Kurd bi xwe jî ve bi Rêçeke dinî Musulmantîyê ve têtin bigirêdan, ku ew jî bi xwe jî ve Rêça Şafîyî ye û Turk bi xwe ve, weke ku tête binaskirin, ew li ser Rêça Henîfîne. Weha bi diyarî jî ve ev xuyanîya biçûkî hanê jî dikare bi hoyê cudakirinê ve bête bikin.

Herwehaji hin xuyanîyên din jî dikarin roleke giringtir jî bidin biyarîkirin; jiber hin Malbatên Kurdan têtin bidîtin, ku ew ji xwe re dibêjin, ku ew ji Nevîyên Malbatên Xulefayên Pêşî nala Amewîyan û Abasîyan têtin bidakevtin (li Şerefname de bide bitemaşekirin). Weha xeberek tête bigotin, ku Ala Kevnî Abasîyan hêjî tanî niha jî ew li Botan de tête bihilanîn.

Jibervêjî bi xwe ve Mafeyê Sultanên Turkan bi Xilafetê ve tête biparastin. Ev bi xwe jî ve li tevaya Cihana Musulmantîyê de bi xwe jî ve li ser de hîç nayête bilêgûmankirin⁵⁵. Lêbelê ji tevlivêjî

⁵⁵li ser ne rastîya bi navkirina Sultanên Osmanîyan de bi Xelîfan li V. V. Bartold, Xelîfe û Sultan, Kovara "Cihana Musulmantîyê", sala 1912 de. Jimar 2-3, "bi Zimanê Rusî ve" bide bitemaşekirin.

Kurd bê Istenbolê jî ji xwe re dikarin li ser rêyeke Oldarîyî nîşankirî de bêtin biçûyîn.

Weha li Kurdistana Îranê de (herema Deşta Tal li Dorhêla Banê û hin ji Eşîrên din de li Zehaw) de hin Eşîrên Şîî hogirîya xwe ligel Îranê didin biparastin. Ji xweşbextîyê ez ligel hinekan ji Mayînên van Eşîrên hanê de hatim birûniştin, ji yên ku ew ligel Eşîrên din de hatine bitevlihevkirin û Bawermendîya xwe dane bijibîrkirin.

Pir bi giringî vetête bidîtin, ku em divê bidin bibîrxistin, ku Şêxên Dîndarên Kurdan xwe bi Musulmantîya Mîrî ve pê nadin bigirtin. Herwehaji tevî ku ew Sunî jî têtin bidîtin, lêbelêjî tevlivêjî rawestandînan wanî cudajî têtin bidîtin. Weha Şêxên Şemdinan û Şehrezorê (li gundên Tewîle û Biyare li Hewremanê) de ew ji bona Rêya Sofiyî Neqşebedî têtin bigirêdan. Ew bi tundtir ji xeynî xwe ve, xwe bi fêrbûnên Musulmantîyê ve didin bigirtin û ew bi pakbûna xwîna Binemalên xwe û perestbûna gorên Bav û Kalên xwe ve didin bibawerkirin û bikarîna hinera veşartî di nava canê wan de didin bibawerkirin.

Ev Bizava Sofitîyê li nik me de di mêjûwê de bi nav û deng ve tête bidîtin. Pir bi başî ve bi bîra min ve tê, roja ku Evserekî Turkî ligel Siwarên xwe de ji bona nik Şêx Ebdul-Qadir Endamê Civata Pîremerdên Turkî ji bona nava cihê wî li ser sînor de hat, ew tevde ber bi wî ve bi hemû rêz û rûmetgirtin ve hatin bipêşkevtin û wan li pêşîya wî de xwe bi hemû dilovanî ve datin tewandin û herdu destên wî ji xwe re dane bimaçkirin.

Lêbelê Şêxên Şehrezorê pir bi rêz û rûmetgirtineke pirî mezin ve ne bes tenê li nik Kurdan de têtin bidîtin, lêbelêjî ji bona Tekîyên wanayî dûr di nava cergê Kurdistan jî de Xelkên Asya Navînî jî ji Welatê me jî xwe li wan de didin bigirtin. Weha Son dîtînan xwe ligel Musulmanên Bêsarbî de dide biderxistin, ji yên ku wan ji bona Şêx li Biyarê de didan biserdan, piştî ku ew ji Mekê û Bexdadê dihatin bizîvirandin.

Weha Şêxên pir bi zanebûneke pir gewre ve û bi nermbûneke pirî fireh ve di fêrbûnan de li herema Sawçeplaxê de têtin bibelavkirin⁵⁶.

Wisa ji xweşbextiya min bû, ku ez ligel yekekî ji wan de pir caran hatim birûniştin. Ew bi xwe ve Derwêş û Sofîyek bû, Mirovekî rûliken bû, pir bi rûmet bû, xwedan aghdariyên pir dewlemend bû û bi serdejî hêjbêtir ve ew Xweşxuwanyanekî bi nav û deng bû. Weha Hevalê minî kevin di geryanên xwe de D. D. Bilyayêv ew jî bi xwe jî ve ligel vî Şêxê hanê jî de di sala 1914 jî de hatibû birûniştin. Derwêşan gotinên "La İlahe İla Allah" ji xwe re û di ber xwe de didan bivegerandin û ew di pêşîya pêşî de xwe hêdî, hêdî didin bilivandin û bihejandin. Di pişt re ew li ser ahengên dengên Erebanên gewre de xwe didin bilezkirin, tanî ku ew xwe di zîneteke ne di cihê xwe de ji serxweçûyî û surketî de dibînin. Ew ji cihên xwe xwe didin biçengkirin û ew xwe bi xwe ve bi serên xwe ve lihevandin dan yanî ew bi serên xwe vê poşan bi dîwarên Odê ve didin bidan. Ew xwe li dor xwe de bi lezbûn ve xwe didin bizîvirandin. Weha mûyên porên serên wanî dirêjî bi tov ve ji hev têtin bibelavkirin. Weha ew Kurdên hanê bi livandinên dînîti ve radibin û ew xwe ji bona nava govendê didin biavêtin. Hîç gûman têde nayête bidîtin, "ku ev zînetî dînîti di Bînvanan de dide bikêrkirin"⁵⁷. Ev dîtina hanê ji bona Ewropîyên li wêderê de tiştekî pirî seyrbû. Weha yekekî ji wan beramberî vî karê hanê tûrebûna xwe date biderxistin û wî ji Şêx date bihêvîkirin, ku ew bi rawestandina vî karê hanê ve bide bifermankirin. Weha bi nîşaneke sivik ve ji bal Şêx de Dunya hate bibêdengkirin û Hiş hatin bisarkirin.

Weha em dibînin, ku ji bona Sofîtiyê destpêkirinek wêyî taybetî têtê bidîtin, ku ew bi xwe ve xurû ne ji Musulmantiyê têtê biderketin. Herwehaji, Tevlivêjî Jiyana Oldariya Kurdan bi

⁵⁶Li wan de li "Serdana min li Meraxe û herema Çemê Cagat û Tawtaw", Nûçeyên Baregeha Rêberiya cengîni de ya herema Qeqasê, sala 1907 de, Jimar 20 de, Çapa ne veşartî "bi Zimanê Rusî ve" bide bitemaşekirin.

⁵⁷D. Bilyayêv, Gotara li ser Beşê Jorî-Rojhilatî Kurdistanê Îranî de, Nûçeyên Baregeha Rêberiya cengîniyî herema Qeqasya, sala 1910 de, Jm. 29, 30 "bi Zimanê Rusî ve". Ev Gotara hanê pir bi giringî ve têtê bidîtin û ew aghdariyên pir li ser Êtnogirafiya heremê de dide bidan.

cudabûna gewre ve di Rêçikên Oldariyê jî de têtê binîşandan. Weha Du Oldariyên pirî sergermî sersurandî avkirî li ser bingehên perçeyên Kurdî de têtin peydakirin.

Ya pêşî ji wan ew bi xwe ve Yezidî ye⁵⁸. Ew li ser yasayên Bawermendîyeke pirî kevnar de têtê biçûyîn.

Weha ji bona dozandinê li ser wêjeya Ola Yezidî de di van salên dawî de giringbûneke pirî mezin hate bidîtin. Weha bigir berî Sed salî me li ser hebûna Nivîsta wanî Oldarî de dizanî bû, lêbelê em li ser navroka wê de ne agehdarbûn.

Weha di sala 1895 de yekekî ji Mujdevanên Ingilîzî A. Barî dikarîbû metnê Erebi bide bibelavkirin, ji yê ku wî ew date bidozandî, ew bi Du Nivostên biçûk ve dihatin bidîtin, yek ji wan bi "Kitab Elcelwe" û ya din bi "Mişefa Reş" ve dihatin binavkirin⁵⁹. Lêbelê Keşê Katolîkîyî Erebi Anastas Marî wî Metnê wêyî Erebi ligel Metnê Kurdî de di yek demê de date bibelavkirin⁶⁰.

Weha Metnê Kokî bi guhpêdaneke pirî bi çavdêrî ve di sebetekê de di serdaba perestgehê de li çiyayên Şingalê de dihate biparastin.

Weha A. Marî di karîbû Pasevanekî Perestgehê bide birazîkirin. Wisa bi vî rengî ve wî bi dizî ve dikarîbû di nava Du salan de Daneyeke rast û durûst li gora Koka Destnivîsê de jiber bide bigirtin. Ev jî weha dihate bikirin, ku wî kaxezeke pirî tenikî bi ronahî ve li ser pelê destnivîsê de dida bidanîn û wî tîp didan bineqîşandin, yên ku wan xwe di nava kaxeza tenik de didan bidiyarkirin. Ev karê hanê pirî dijiwarbû; jiber Metnê Kurdî bi tîpên veşartîyî taybetî ve hatibûn binivîsandin. Lêbelê Marî ne bes

⁵⁸Yezidî ew ji bona Rêçvanan bi navkirineke gelêrî ye. Weha têtê bibawerkirin, ku ev navê hanê di koka xwe de ji gotina îranîyî kevin "Yezd" têtê biderketin, ya ku ew bi têgihîştina Xwedan têtê biliberkevtin.

⁵⁹O. H. Barî, Şeş Meh di Dêra Aşûrî de, sala 1895 de. Metnê Duwem yekekî ji Filên Rojhilat, ku ew jî bi Îsa Yûsiv têtê binavkirin, di bin navê "Metnê Yezidî" de di Kovara Emerîkî de ya Zimanên Samî de, sala 1909 de, Bergê 25, Jm. 2, 3 de date biçapkirin.

⁶⁰Kovara Êntropolocî, sala 1911 de, Bergê Şeşem de, Deftera yekem de.

tenê jiber Destnivîsê date bigirtin, lêbelêjî wî jî hêjbêtir Veşartîyên wê jî ji hev datin bivekirin.

Weha di dawîya dawî de M. Bitner ev metnên hanê di belavokeke zanistî de li Vîn de di sala 1913 de date bibelavkirin.

Lêbelê tiştê ku dil pê tên bijandan, ku belê Zanistvanên Ewropayî ji kar û barên Rusî di vî warê hanê de jê sûd ji xwe re nedan biwergirtin, ku ew bêgûman jî pirî binerx bûn. Weha Şahbenderê Rusî Y. S. Kartsov⁶¹ lêgerandinek li ser Yezîdîyan di sala 1884 de date binivîsandin. Ew têde dibêje, ku wî hinek ji perçên "Kitêba Elcelwe" bi xwe ve dîtine û wî di pişt re jî ev perçên hanê jî dane biwergerandin, yên ku hîç di rastîya wan jî de nayête bidîtin. Lêbelêjî Anastas Marî bi xwe ve wî rûmeta belavkirina wê Belgeyî giring bi destên xwe ve date bixistin. Derîyê tê li nik Kartsov bi xwe ve ew diyarkirineke nêzîkî li ser naveroka Nivîsta Yezîdîyî duwem "Misefa Reş" bi xwe ye. Musulman yezîdîyan bi Şeytanperest didin binavkirin, lêbelê niha û piştî dozandinên kanî û agehdariyên nuh di vî babetê hanê de ev "Cinêwdana" hanê nema jêre hîç cihek tête bidîtin û ne jî ew jî hîç dujwarîyekê dikare bide biçarekirin.

Di rastîya rastîyê de Yezîdî bi xwe jî ve didin bidazanîn, ku Şeytan bi xwe ve ji wan re Xwedan "Melekê Tawûs" yanjî "Bavê Tawûs" tête bidîtin, lêbelê tête bidîtin, ku ev bi xwe ve yekek ji nişanê Xwedaniyê bi xwe ye. Yezîdîtî bi xwe bi pîrbûn ve ew xwe nala Rêçeke Dualîyî Bawermendî (yanî bi Du Hêzan bawerkin) didê biderxistin.

Lêbelê ev Dîtina hanê bi xwe ve ne rast tête bidîtin, jiber Qencî û Xerabî ne nala dijûnên bingeşî di pêşî de (Hurmuz û Ehremen) têtin bidîtin, lêbelêjî bi servajîvêjî ve tevaya Afîrandînê ji yek

⁶¹Li vê derê de divê bête bigotin, ku Kartsov bi xwe ve ew ne Serhengê Kartsov tête bidîtin. Karên Y. S. Kartsov û yên Pirofîsor Yegyazarov li ser yezîdîyan de di Tomarkirinên Beşê Qefqasîyî Civata Ciyografi de, Bergê 13 de, Belavoka Duwem de hatine bibelavkirin. Herwehaji jî xwe re li Y. Kartsov, heft sal li Rijhilata Navîn de, sala 1906 de, R. 187-190 de bide bitemaşekirin. Ji bona nimûne ez dibêjim: ku min li Helebçe de Lawê Dektorê cengê Bironislav Xêmîl date bidîtin, yê ku wî Kartsov dida bidermankirin. Ev Lawîkê hanê li wê derê de ma û ew li wê derê de li ser Musulmantîyê hate bixwedîkirin. Weha Gencekî Kurdîyî xurû jê hate biderketin. Ew bes û bi tenha ve ji Kurdan bi rengê porê xwe ve dihate bicudakirin.

kanîyê tête biderketin. Weha nîşanên Şeş (yan Heft) Fereşteyan "Bavê Tawûs, Izraîl, Israfil, Toraîl...hd" hemû ji yek kanîyê têtin biderketin û ew bi xwe jî ve mîna afirandina ronahîyê ji ronahîyê hatine biafirandin (Agir ji Agir tête bipêkhatin).

Weha ev Cihana Dîdar ji bal van Heft Hêzan de hatiye biafirandin, ji bil Agir yê ku ew ji bal xwedan de xweser bi xwe ve vehatiye biafirandin.

Weha Şer di dîtina Yezîdîyan de bi xwe ve ew ne nala hêzeke Serûştî tête bidîtin, lêbelê ew bi xwe ve xuyanîya xwestineke azadiyî ji bal Xwedan de bi xwe ve hatiye biderkevtin û ew dê piştî lihevhatina Gîştî nemana wî bi xwe ve bête bidawîkirin.

Weha Qencî bi rengekî demî ve ji canê Xwedan hate bicudakirin. Bavê Tawûs li nik Xelkên vê Rêçê de ew cihê jê re nivêjê û perestkirin bi xwe ye⁶². Yezîdî bi veguhestina can ve didin bibawerkirin. Ew Agir û Ronahîyê didin bipereştkirin. Ew pir tiştan didin biqedexekirin: Ew ne xesan, ne baqilan û ne masîyan didin bixwarin û ew ji rengê Şîn li ber xwe...hd nadin bikirin... Pîrên wanî di Civatên taybetî de bi rêxistî û herwehaji Perestgehên wanî taybetî jî ve têtin bidîtin. Perestgeha wanî Serokî bi xwe ve ew berê li Laleşê de (li dorhêla Musilê de) di Dêreke Filan de bû. Di vê Dêra hanê de Şêx Edî⁶³ hatiye biveşartin.

Vî Mirovê hanê pakbûna Oldarîya Yezîdîtiyê dayite biparastin û wî bi xwe jî ve "Kitêba Elcelwe" dayite bidanîn. Weha ji bona xweşbûna dil ku gundvanên Musulmanan vî Kesê hanêyî mêjûyî, yê ku ew di Sed salê duwanzdehên Zayîne de hatiye bijîyandin, wî nala Musulmanekî pîrî qenc didin bidanîn û ew wî ji Oldarîyeke din yanjî ji bawermendîyeke din nadin bidanîn.

⁶²Weha Agehdariyên pir dewlemend û wêneyên Malên Xwedanên wan di nivîsta W. Wagman de, Kenîse û Mizgeft li Erministanê û Kurdistanê de, Laypzig sala 1913 de, R. 9-15 "bi Zimanê Elmanî ve".

⁶³Weha agehdariyên pir dewlemend li ser Yezîdîyan de ji sala 1856 têtin bidîtin. Ji xwe re li Lêrç de, Bergê yekem, R. 47 bide bitemaşekirin. Lêbelê li ser lênerîna wan de li ser Şer ji xwe re li Mar de bide bitemaşekirin. Weha Evsanek dibêje: ku Melek Tawûs xwe ji Xwedê date bicudakirin; jiber ku ew bi xwe ve pir bi xwe payebû û jibervêjî wî nexwest, ku ew serî ji bona Afirvanê xwe de bide bitewandin.

lêbelêjî tevlivêjî Xelkên Musulman Merqeda wîna di sala 1415 Zayînê de datin bihilweşandin, lêbelêjî demeke dirêj jî di ser vê jî re nehate biderbaskirin, tanî ku careke din Hevalbendên wî ew ji nûve datin biavakirin.

Yezîdî di her sal de di 23 Ilunê (Sebtemeberê) de Heft rojan bi cejneke Oldarî ve cejnê didin bikirin. Layardê Ewropî bi tenha xwe bû, yê ku wî dikarîbû di nava wan ahengan de bête bibeşdarkirin. Ew ahenga şevê û limêjên di bin ronahîya mûman de û di bin dengê zurnê u daholê de dide bipesindan.

Weha di dawîya dawî de li ser me de divê, ku em bidin bibîrxistin, ku "Melek Tawûs" bi xwe ve ew wêneyekî Tawûs bi xwe ye, yê ku ew roleke pirî gewre li nik Yezîdîyan de dide bilîstin⁶⁴. Weha hinek ji Zanistvanan bawermendin⁶⁵, ku pêwendîyek di navbera peyva Tawûs û navê Babilîyî kevin "Temûz" de, xwedanê Rojê û germbûna Havînê de, tête bidîtin. Herwehaji hin ji wan Zanistvanan jî didin bigûmankirin, ku hin pêwendiyên din jî di navbera Yezîdîyê de û di navbera Oldarî û Rêçikên kevnar de di Welatê Navbera herdu Çeman de têtin bidîtin. Rewşen bû, ku di Sedsalê Yanzdehê Zayînê de Xelkên bajarê Heranê (li dorchêla Orfayê) Xwedanê Heyvê "Sîn" jî xwe re didan biperestkirin, yê ku ew li nik Yezîdîyan de bi "Şêx Sîn" tête binavkirin⁶⁶.

Gerjî çawa jî be, Yezîdîti bi xwe ve nala Rêçekê jî tête bidîtin, ku têde pir perçên pêşeyî têtin bidîtin û diyardîrîn tişt li ser vê jî de

⁶⁴Wêneyekî bi tenha xwe ve, Laşekî Bironzî çêkirî di Gotara Instas Marî de tête bidîtin.

⁶⁵Profêsor D. A. Xufolson wî bi xwe ev bîr û bawerîya hanê di cara pêşî de pê date bidazanin. Mehna yên ku vê bîr û bawerîya hanê didin bivegerandin, ku li nik Yezîdîyan de hiç Cejnek di dema germê de Tirmehê de nayête bidîtin, lêbelê jî evaya bi xwê jî ve hiç tişteki nade bibiryarkirin.

⁶⁶Torayêv, Mêjûwa Rojhilata Kevin, Bergê Yekem, R. 78. Weha Merov dikare bide bibawerkitin, ku di navbera yezîdîyan û Sayibîyên niha de tîtişteki hevbeşî tête bidîtin, -nemaze der barê şûştina wan de bi avê ve-. Ji xwe re li A. A. Admov, Îraqa Erebi, sala 1912 de, R. 224-260 "bi Zimanî Rûsî ve" lêbide bitemaşekirin.

bi xwe jî ve Bawerî û Dîtinên wan li ser afirandina Şer de didin biderxistin.

Weha Amara Serjimara Yezîdîyan bi Sed Hezar Kes ve li Turkiyê (li Şîngalê, Musilê, Hekarê de) de dide biderxistin û li nik me de li Qefqasîya de 25. 000 Kes Yezîdî dijîn, mîna ku Serjimara sala 1910 dide biderxistin⁶⁷.

Lêbelê Oldarîya din Alî Ilahî⁶⁸ ye. Ew bi xwe ve Oldarîyeke kurdîyî xurû ye û hêjî bi têrbûn ve li ser wê jî de nehatîye bigerandin. Weha kesên, yên ku ew li tiştan de bi dîtîneke tenik ve didin binerîn, ew bi xwe ve dibêjin, ku pîrs bi xwe ve di Xwedankirina Xelîfê Çarem Alî de têtê bigivaştin. Wehajî ew Kesan jî bîr û bawerîyên Musلمانan di Afirandinê de didin bivegerandin.

Weha pîrs li nik wan Kesan de mîna veguhestina Canan bi hev re têtê bidîtin, ku ev jî bi xwe jî ve bêgûman jî li nik Musulmanên bi nav û deng jî ve têtê bivegerandin⁶⁹. Lêbelê derbarê nîşana diyar ya ku ew bi Rêça Alî Ilahî ve têtê bigirêdan, ku Xwedanetî Heft

⁶⁷Hiç gûman têtê nayête bidîtin, ku Serjimara Yezîdîyan di berê de bi gelekî ji vê Serjimara hanê ve bêtrî dihate bidîtin. Weha di Şerefname de li ser Mîrên bi nav û deng de li Cezîrê de hatîye binivîsandin, "ku wan xwe pir birabûn û rûniştinên Rêça Yezîdî ve didan bigirtin", Wergerandina jibergê Duwem, R. 153. Eşîra Sêpkî, ya ku min ligel hinekan ji Kesên wê de di sala 1853-1856 de li dorhêla Beyazîdê de date bidan û bisitandin, ew bi xwe ve ji Yezîdîyên Musulmankirîbûn. Aviryarov

Herwehajî li Îranê jî de bes û bi tenha xwe ve gundekî Yezîdîyan li Mîrşîya Mako de gundê Cebarlû nêzîka 25 Malan ma bû. Ji xwe re li "Raportê min li ser Serdana Mako de di sala 1905 de, R. 23, 24" lê bide bitemaşekirin.

⁶⁸Alî Ilahî xwe bi navê "Ehl-Elheq" didin binavkirin. Birek ji wan li nik me de li Rusya de li Melbenda Ilizabêş Pol de li herema Qarsê de dijîn. Lêbelê li Qefqasîya piranîya wan ji koka Kurdan nyyêtin bidîtin, lêbelê ew bi xwe ve nala Oldarîyeke taybetî lêtête bitemaşekirin.

Herwehajî di Neqşên Mîrî jî de ji bona wan nala Oldarîyeke taybetî jî têtin binîşankirin. Ji xwe re li: Tomarkirinên Beşê Qefqasîyî Civata Ciyografi, sala 1879, Nivîsta Nozdehan û li salnama Qefqasî ya sala 1907 de bide bitemaşekirin.

⁶⁹Ji xwere ji bona nimûne li "Bustan Elsiyahe" de R. 271 bide bitemaşekirin.

Caran li Cîhanê de tête biderketin, weha jî ew carekê jî di Alî de hate biderketin. Wehaji ligel her Xwedanekî de Çar Ferîşte jî têtin biderketin, ku ew jî xwedan nîşanên Giştîyî Xwedanin.

Alî Ilahî bawermendin, ku Mohemedê Pêxember yek ji wan Fereşteyên Hevrêyê Alî bû. Lêbelê "daxuyanîkirina veşartinan" ew bi xwe ve ne di pêla Xwedanîtiya Alî de hate bikirin, lêbelê ew di pişt wî re di Serdema Baba Xoşin û Sultan İsaq de hate bikirin. Divê li vir de bête bigotin, ku Xwedanetî -di Dîtina wan de- ji bona Serokê Fereştan dihate bidestjêrkirin, ya ku ew bi wî ve pê dihate biyekkirin⁷⁰.

Alî Ilahî bi veguestina Canan ve bi hev re didin bibawerkirin. Ew dibêjin, ku mirin mîna "werdekekê tête biderketin, ya ku ew xwe di nava avê de dide biveşartin". Ew xwe li cihekî de dide biveşartin û ew careke din xwe li cihekî din de dide biderxistin.

Ji dilxweşîya reweştên wan biratîkirin (yanî ne Bira bi birakirin). Ji Reweştên wan jî, ji yên ku ew roleke giring didin bilîstin, bi xwe ve parvekirina nanekî taybetî û goştê bi taybetî ve bi biratî ve têtin biditin. Vê bi xwe ve hişt, ku hinek ji xwe re bidin bibawerkirin, ku ev reweştê hanê ji Rêçikên Filetîyî kevin hatîye biwergirtin, ji yên ku wan nan û goşt li ser Xelkê de didan biparvekirin.

Lêbelê ez bawerdikim, ku evaya bi xwe jî ve ne rast tête biditin; jiber Rêçika Alî Ilahî bi hemû dûrbûnên xwe ve û berên xweyî giştî ve ligel Filetîyî de di tu tiştî de ew bi ser hev de nagihên bigihaştin.

Alî Ilahî ligel Musulmanan de her û her bi dujminatî ve dijîn. Qizil Baş, yên ku ew bi vê Rêçika hanê ve didin bibawerkirin û yên ku ew li tevaya heremên Dêrsimê de dijîn, ew bi xwe jî ve ji bona Turkan serên xwe nadin bitewandin⁷¹.

⁷⁰Wê ligel Rêça İsmailî de bide biberamberkirin, ya ku ew Afirvan nala "Patîşahê Mezin" yanî "Hişê Cîhanê" dide biderxistin û ew wî ne nala Yezdanîyê bi xwe ve dide biderxistin.

⁷¹Rêça Alî-Ilahî li nava Îranê, Turkî û di navbera Miletên din de xwe date bibelavkirin. Li Asya Biçûk de pir ji Turkmanan bi vê Rêça hanê ve xwe didin bigirtin. Ew li Îranê de û bi taybetî ve li herema Ezirbêcanê de pê têtin bipirkirin. Weha tête bigotin, ku Serjimara wan di pêla Berxê Reş de di Sedalê

Wehajî bi xwe ve Alî Ilahî, yên ku ew li Turkî de dijîn, li vê bîr û bawerîya hanê de didin bipiştgirtin û ew jî Qezil Başan ji Rêçika xwe dibînin. Weha ev bi navkirina hanê ve bi xwe jî ve ji bal Farisan ji bona pê kenînê û pê qeşmerîkîrînê bi wan ve têtê bikaranîn. Weha têtê bibawerkirin, ku ev Rêçika hanê xweser li îranê de hatîye biderketin û ew li Asya Biçûk de hatîye bibelavkirin.

Ji dilxweşîyê têtê dîtin, ku Qezil Başên li Turkî de ji xwe re didin bibawerkirin, ku Daketina Xwedê ji bona ser erdê ji bona bi rabûna kar û baran hatîye bidîtin. Herwehajî ew didin bibawerkirin, ku Şervanê Alî "Şûrê Zilfeqarê xwe" ji bona Rusya û "Perçema Kesk" ji bona Ingilistan date bidiyarîkirin, da ku ew Turkan bidin "biqirkirin".

Weha Gervan û Zanistvanê Rusî li Wilayeta Sîwasê de di sala 1913 de ji Xelkên vê Rêçika hanê date bihîstin⁷², ku dê Alî di sala Sîhî de (yanî 1330 K.) bête bidîtin. Weha Xelkê xwe li kar didate bixistin, da ku ew pêşewazîya daketîna Xwedê bidin bikin. Lêbelê ji dilxweşîya li hevraştatîyê hate bidîtin, weke ku me berî vê date bigotin, bi rast û durûstî ve ceng bi xwe ve di dawîya sala 1330 Kocê de hate bidestpêkirin⁷³.

Li nik Alî Ilahîyan de Wêjeyeke tomarkirî bi Zaravayê Goranî têtê bidîtin. Ji xweşbextîya min, herwehajî di cara pêşî jî de Destnivîsên vê Wêjeya hanê bidestên min hatin bikevtin. Weha min yekek ji wan Destnivîsan, ku ew Nivîsta "Ser Encam" bû, date çapkirin⁷⁴.

Panzdehan de hate pirkirin; jibervêjî Serokên wan ji bona nava Turkîyê hatin bibangkirin. Ji xwe re li: F. Bartold, Turkî, Musulmanî û Filetî, Kovara Mehane, sala 1915 de, Jimara Duwem bide bitemaşekirin.

⁷²Şahbenderê Firensî Kirinar evsaneke mîna vê guhê wî pê hate bikevtin. Ji xwe re li rûnkirînê wî de li ser Yezidiyan de li Rusya de, Nûçeyên Baregeha Rêberîya herema Qeqasê, sala 1905 de, Jimara 7, 8, sala 1907 de Jimara 19 "bi Zimanî Rusî ve" bide bitemaşekirîn.

⁷³V. A. Gordîlêviskî, Tablowê Rusî, 23 çîrya pêşî sala 1914 de, Kanîya berê bi xwe ve 16 Rêbenda sala 1915 de, "bi Zimanê Rusî ve".

⁷⁴V. Minoriskî, Metiryalên ji bona Xwendekarîya Rêça Îranî "Ehl Elheq" yanjî "Elî Ilahî", Mosko, 1911, Beşê Yekem "bi Zimanî Rusî ve".

Herwehaji di pêla Gera minî dawî jî de di sala 1914 de min dikarîbû Wargeha Perestî Alî Ilahîyan li gundê Pîr Diyur de (li Hewremanê de) bidim biserdankirin. Ew li pişt gir û zinarên pir sext û sengîn de tête bilûsandin. Ev warê hanê ji cihên pîrî ciwanî sipehî bi didarên xweyî Serûştî ve tête biderketin. Herwehaji goşa din, ya ku ew li Rojavayî Zehawê de tête bikevtin, têde li wir de Mezarê Baba Yadgar⁷⁵ tête bikevtin. Ew bi xwe ve di vî warê hanê de bêtir giringtir tête bidîtin. Weha berî min ji bona vê herema hanê Du Gervanên Rusî Baron Bodî û Serheng Çîrîkov hatibûn biserdanîkirin⁷⁶.

Weha Min dikarîbû li hemû veşartî û nehmîyên Rêçikî de di goşeyên cuda de li Baba Yadgar de bidim bitemaşekirin. Evaya jî tevdeji bi saya Merovên Berpirsiyarên ji Alî Ilahî hate bidîtin, ji yên ku wan bawerîya xwe bi min ve datin bisipartin û wan hemû xwestîyên min ji min re datin bicihanîn. Ji bona her bihustekê ji vî erdê hanê yadgarîyên wîyî taybetî têtin bidîtin.

Weha wan ji min re date bigotin, ku di civînekê ji yên Alî Ilahî de weha sur û bê hêşbûn bi Derwêşekî ve hatibû bikevtin, ku wî xwe ji panaya gorê xwe ji bona dola pîrî kûr date biavêtin û wî di wê avêtina xwe de dida biqîrkirin: "Ho Bavê Yadgar vaye ez ji bona nik te tîm. De min bide maçîkirin". Weha ev daxwaza hanêyî pîrî evin ji bona Destanekê hate biveguhertin. Wisa jî ji min re Bînvanên rûdanên bi xwe jî ve datin bigotin, ku Derwêş mir û ew ji hev pirtik pirtik hate bikirin. Weha Rêber ligel min de pir nerm bûn û wan jî biserdeji mûmek ji Gorê û Camek ji çavê Perest "Keselan" ji bona Yadgarîyê ji bona min datin bidiyarîkirin.

Çûna min ji bona wê derê gelekî xweş bû. Wê dîtinên pir xweş û şêrîn di nava dilê min de date bihiştin. Ez wan rojekê ji rojan nadim jibîrkirin, tanî ku ez li ser ruwê vê dunê de bêtîm bijîyanndin.

⁷⁵Wênayê Gorê, ji xwe re li Oskar Man de di "Rojnama Wênekirî" de, 30 nisana sala 1908 de, Jm. 3383 de bi "Zimanê Elemanî" ve bide bitemaşekirin.

⁷⁶Belavoka "Nivîstxana Xwendinê", 1854, Bergê 124, Beşê Siyem "Rojnigariyên Baron K. Budî Endamê Civata Ciyografiya Rusî û Sikretêrê Yekem di Encûmena Imperetoriya Rusî de li Tehranê de".

Ez nikarim vî Derîyê hanê bînim bidawîkirin, bêyî ku ez letekî ji rojanên xwe li vir de nedim bitomarkirin:

"Di 21. Nîsana sala 1914 de-Şev tava heyvê bû û Esman pirî sayî bû.

Li vir û dera hanê de kavlên Kelehên kevnar li ser çiyayên nêzik de hatine biherifandin. Lutikên çîyan xwe bi ser newal û dolên sext û seng ve û poşayî bi daristanên pir ve bi darên bi pel û pirî ciwan û sipehî ve dane xuzkirin. Komên ji Kajên tarî li dorhêla lutikên sipî de mîna hêka cûk, lêbelê pirî gewre xwe di hêlîneke keskîyî pirî bi tov ve dide bilûskirin.

Weha çirke çirka nerm ji nava cerg û hinavên çûkên pirî belavkirî mîna banga Derwêşan ya "ho ho" her û her lihevvegerandî dihate biderketin.

Herwehaji zengilên Histira min ji xwe re tinge ting didan bikirin û Pasevanê Qefqasîyî Histirên me sitirana Kobanî ji xwe re dida bisitirandin.

Belê evaya çend xewneke pirî xweş bû. Weha min Duwanzdeh salan ji bona hatina vê Hêla pirî ciwan date biçavdêrkirin, lêbelê di dawîya dawî jî de lihevraştatinê bi min ve ber bi vê Hêla hanê ve date bipalpêdan.

Weha her û her min di nava kevnariyê de ji xwe re dida biremankin û hêdî hêdî pêhestkirinên min xwe ji bona ber singa kevnariya vê Gora perestî hanê didan birakişandin.

Parastina vê goristana perest Nîfşekî ji Nîfşekî din ji xwe re dayîte biwergirtin û wan tevaya jîna xwe bi carekê ve di nava himbêza Perestê xwe de datin bibuhurandin.

Weha wan her û her çavdêriya rûpelekî Mermerî di siya wan Kesan de didane bikirin, ji yên ku ji xwe re Bav û Kalên wan dabûn dîtin. Wehaji dibû, ku hinekan ji wan jî xwe di nava civata Merovê xwedan veşartî û xwedan nivîşt Baba Yadgar bi xwe jî ve bidana bidîtin"

Derîyê Şeşem

Sincîya Kurd

Sê xuyanîyên pirî girng di hemû alîyên Sincîyî de li nik Kurdan de datin û hêjî didin bikêrkin: Jîyana Sedsalên Navînîyî Mîrşîniyên Kurdîyî Biçûk⁷⁷, Rêstikên Êl û Eşîrên Kurdan û herwehaji di dawîya dawî jî de bi karanîna Kurdan ve ji bona mebestên siyasîyî diritî ji bal Turkan de têtin biderkevtin. Weha dê emê li ser van pirsên hanê de bi vî şeweyê hanê ve li ser wan de bidin bilêvenerandin: Weha Abovîyan⁷⁸ Kurdan bi "Pehlewanên Rojhilatê" ve dide binavkirin. Hiç gûman têde niye, ku ev nasîna hanê hêjî bi rengê taybetî ve li ser têgihiştina xwe de dide biparastin, ger ku li ser Çînîya Bala de ji Kurdan (Serokên Êlan û Derebegan) bête binêtkirin. Ev bi xwe jî ve bi carekê ve di warê kar û rastîyê de li ser jîyana Sedsalên Navînî de li Kurdistanê de tête bisuwarkirin.

⁷⁷Ez gûman nakim, ku Têgihiştina "Derebege" li ser tevaya van Mîrşîniyên hanê de tête bisuwarkirin, yên ku ew di rastîyê de ji Xwedanên Dolan di nava Çîyan de li Turkîya Kevin de têtin bipêkhatin. Lêbelê tevlîvêjî li hinekan de ji heremên mîna Hekarê, Botan û Sulêmanîyê Mîrşîniyên mezinî desthilatdar li ser heremên pirî fireh de hatin bipêkhatin, ji yên ku ew berê ne di nava wan heremên binavkirî de dihatin bidîtin. Herwehaji divê li vê derê jî de bête bibîrxistin, ku Serdarê Kurdistanê Erdelan li Welatê Faris de bi navnîşana mezin Walî di hate binavkirin û ew bi carekê ve bi serê xwe ve azad bû. Ew ligel Walîyên Gurcistanê, Loristanê û Erebistanê de di ahengên Tackirina Şahînsahiyan de di hate beşdarkirin. Wî darekî bi Almas xemilandî ve bi destên xwe ve dida bigirtin.

⁷⁸Emê di pişt re Metnekî bi carekê ve li ser Kurdan de ji bal vî Danerî de bidin bitomarkirin.

Rewşene, ku kurd nemîna "Pehlewanên rûdîlşikestî" li Ewropa de tête bidîtin, ku ev pesindana hanê jî bi xwe jî ve nîşana rûmetşikenandinê û çepelkirinê bi xwe ve tête biderketin. Lêbelê jî tevliwê jî ma ev xuyanîya hanê jî ne ji mezinbûna Kesîtiyî di Sedsalên Navîn de di hate bidîtin, ku Merov ew Xanedanê bi kal û Bapîrên xwe ve pir serbilind bû, yê ku wî pir Mirov li nik xwe de didan bixwedîkirin. wî pir ji sitiranan û nêçîrê dida bihezîkirin. Bac û bêş li ser her tiştî de, ji yê ku ew li ber çavên wî de diçûn û dihatin, wî dida bikomîkirin. Wî guh pê ne dida bidan, ku ew di şevên reş û tar de xwe ji cihê xwe bide bidûrîkirin û ew xwe ji bona Bajêrê mezin bide bigihaştin, da ku ew Xelkên bed bide binabûdîkirin.

Herwehaji gerjî kêş jê re bihata bidîtin, wî bêhnêkî jî ji nava destên xwe ji xwe re nedida biberdan, ku ew Bêzentiya Fîletîya lawaz ji xwe re nede bitalankirin.

Weha ew cudabûna, ku em li ser wê de li Kurdistanê de hatin biaxivtin, herwehaji sernetewandîna Kurdan ji bona herdu Dewletên Serbixwe Turkî û Farişî jî, xwedanîya wan bi rewşeke abûrîyî pirî baş ve, herwehaji pêwendîyên Cotkarên wan ligel Serokên xwe de, van tevan bi hev re bi carekê ve hoyê xweser ji bona pêkanîna vî rengê taybetîyî pirî baş ji Derebegîyê datin bipêkanîn.

Weha ji bona nimûne divê ku em li ser pîrsa Serbilindaya Kurdan bi Tuxum û Koka xwe ve bidin bipeyivandin. Wehaji li vê derê jî de vaye ez veşartîyeke biçûk didin biderxistin, bê ka çawa Merov dikare dilxweşîyê û bextiyarîyê bi nava dilên kurdan ve bide bixistin.

Weha di rojên çûna xwe de min dikarîbû darê Bavikên Serokên Eşîran bidim biamadekirin yanjî bidanîn. Her gava ku min ligel wan de civîn didane bikin, min ji wan re pêwendîya Pismam, yanjî Pisî Pismam ligel hev de dida bidîyarkirin. Mîna gotina ku Bavpîr Axa bi xwe ve ew lawê Apê Bayîz Axa, yan jî Pîrot Axa bi xwe ye. Vê dilşadîya hanê dilên wan pir didan bişahîkirin û bixweşîkirin. Ji her alîyekî ve, ji her goşekê ve gotinên bê dawî li ser de dihatin bikin. Weha li Kurdistanê de pir Nexwendewar jiberve deh yanjî panzdeh navan ji navên Bav û Bavpîrên xwe ji xwe re didin bijiberîkirin.

Herwehaji li Kurdistanê de pir aliyên jînê dilşadiyê, bînfîrehbûnê û bextiyariyê di Kelehên Serokan de didin bîderxistin. Ez li vê derê jî deyana Hevalê xweyî Serdar Mokrî dixwazim bidim bîpesinandin, yê ku ew bedbext bû; jiber ku Turkan di Meha Befîrbarê de di sala 1914 de ew dane bîkuştin, gava ku wan Tebrîz jî xwe re dane bîvegirtin.

Serdar ez jî bona Dîwanxana xwe li bajarê Bûkan de di sala 1911 de datim bîmêvankirin. Gava ku em li cih de nêzik dibûn, weha di navbera her pênc deqîqan de Komeke jî Siwaran pêşewazî li me de didan bîkirin. Di pişt re Lawê Serdar hate berîya me û wî li me date bîsilavkirin.

Li gund ew bi xwe ve bi pêşîya me ve hat. Peyan û gundîyan li ser sifran de pir xwarinên renga renga jî bona nava bax didan bîkişandin; jiber li dorhêla goleke biçûk de jimareke jî Konan hatibûn bîvedan. Firavînê, di pişt re çayê û Careke din jî Xuwarinê tev de li ser ahengê mûsîqê û sitiranên de didate bîdestpêkirin.

Mêvandarî ne bes tenê jî bona me lêbelê jî bona Xizimetkaran jî pir birinc jî hatibû biçêkirin. Herwehaji ez herdu masîyên gewre jî nadim bîjibîrkirin, yên ku ew herdu jî bi xwe jî veji bona vê Mêvandarîya hanê jî hatibûn bîravkirin.

Merdbûna Serdarê Mokrî dihişt, ku Dirawsên wîna jî hemû layekî ber bi pê ve berên xwe bidin bîvekirin, da ku ew jî vê merdbûna hanê jî xwe re sîd bidin bîwergirtin. Herwehaji Xelk bi Koman jî ve jî bona demeke dirêj jî bona Mêvandarîya wî dihatin; jiber wan pir bi başî ve dîzanibûn, ku dê ew pir bi rêz û rûmet ve bêtin bîmêvandarîkirin. Ez gûman nakim, ku li nik piraniya Kurdên Turkî de wehaji ev reweşt, rabûn û rûniûştinên hanê jî têtin bîdîtin, mîna yên ku ew li nik Mokriyan de têtin bîpeydakirin.

Cudabûnên Ciyografi û Siyasî, Koçkirina jî vir û jî bona dera hanê di bin kêra Rêstikên hîmkirî de, Jîyana lipêhev ligel pêwendiyên Eşîrîti bi rengî pîrî xurt ve, van tevan bi hev re ber li ber pêşketina hestkirina firehîyî Civakî de li nik Kurdan de datin bîdadan. Ew pir kêman xwe di nava gundên Gewre de û di nava bajarên de didin bîcivandin.

Weha da ku em li ber canê Kurd de bêtin bîliberketin, li ser me de divê, ku em li her tiştekî jî dîtina wê Malika Yekane de lêbidin

bitemaşekirin, ya ku ew her û her Remana Qenc û Bed dide bizayînkirin.

Li nik Kurdan Hestkirineke pirî xurttir beramberî Malîfîyê û Êlêfîyê tête bidîtin, ya ku ew jî ya wanî beramberî Mirovaniyê, yanjî Biratîya Oldarîyê, yanjî ew jî Hestkirina wanî firehî Milî jî bêtir tête bidîtin.

Weha me her û her pê dida bihestdikirin, li ku jî de em bihatina bidakevtin, ku Reweştin Civakî û Rêstikên Serdarîyê li dorhêla me de têtin bidîtin û her û her ew xwe bi dû me de didin birakişandin.

Lêbelê ma gelo Kurd divê pişta xwe bi kêve bidin bigirêdan, ku ew bi rastî ve di nava herdu Dewletên Turkî û Farisîyî lawz de dijîn?

Bihêzbûn û hevkarî di nava wan de bes û bi tenha xwe bi başî ve têtin bidîtin, ji yên ku ew xwe bi pêwistî ve pê didin bigirtin. Weha Mirovekî bi tenha xwe ve, herwehaji Maleke bi tenha xwe ve bes û bi tenha ve ji bona mayîna xwe di nava Êlê de dikare li ber xwe de bide bidan.

